Di bin kevir û kuçikên ku bi ser min de dibarîyan



Roza Metîna




Helbest

Min dil daye bêdengiyê



Fatma Savci



Helbest

Li perê bajarekî, bin siya darekê
ye niha mala min.
Dengê sirsirka çawa bû
li çiyayê Şaho li Hewreman
tînim bîra xwe.
Sûsika Simo ye berêvara min
berrîyekê ji min re şên dike
Û Kîvroşkan li nav çêrîyê belav dike,
Ne perwera xemê me,
Ez jî Ji sûlavên kesk hez dikim,
ji tûkê maşt...
Ma tê bixwazî diltenikîyê li
xwe heram
Her beyanî dilê xwe ji evînan
xef bikim?
Ne, ew ne Şehrezad e pêla
deryayê ye her şev heya bi kevîyê tê
Û bîna pelka pirdeqanê li ser
şêwra me belav dike.
Şiyar bibe, Dara xurmê sîya
xwe da ser xewna te
Berya bikevî rê bi heyvê nekevî,
simbileke genimî bike bêrîka xwe
Şev zimzimî?
Niha Îkarûs ji bîr bike,
min dil daye bêdengiyê
Ka îşev stêrekê ji min re bixwîne.


Dexîl yareb!

Ji seher da min da du yar
 Ey hebîbê ser dil dîyar
 Bayê eşqê çol û beyar
 Bûme dîwane yê bê war..


Emir çû bi nar û fixan
 Dil ji eşqê eman eman
 Tenêfî xwe neda berdan
 Wek şimayê reş di kewar...

Eşqê dax kir bi şîşa sor
 Pêva veda wek moza sor
 Heyva çarde wek gula sor
 Çilmisand dil kir gora kor..

Yareb te çi xwest ji dil min?
 Êş û kul tev kir para min
 Rehmê barîn êdî li min
 Dexîl ya hebîbê rehman...



Maral Xezal



- Yanî niha tu şîvê dixwî?
- Dîsa na.
- Tu çi dikî, de ka bêje, sebra min nema?
- Tu çi qas bê sebr î, bi te re ketime axaftinê, ma tu na-bînî?

Wê wextê tu hinekî bê deng mayî, sankî tu bi tişteki hesîya ji alîyê min. Ji ber êdî ji gerokbûna hastên xwe qerifbû. Min dixwest hem jîyan û hem jî hasten wînda di mirovekî weke te de cîwar bikim. Lêgerîna min nediwestî. Hemû şîyan û heza xwe ji bo ku cewîyê jîyan xwe bibînim, dirijand.

Di bersivdanê de tu pir zîrek bûyî, lê nizam çima te ewqas dirêj kir bêdengîya xwe yan te jî weke min nikarî ji xwe û heza xwe birevîya yan jî bi wê bêdengîyê te bersiva erênîyê dida min.

Me herduyan telefona xwe bêtî ku pê bihesin ji guhên xwe bi dûr xist û bi tevlihevîya bûyeran re xwe mijûl kir. Dilê min rêwî bû, ta wê kêlîyê, lê ji dema tu dîtî û ta niha xwest di karaxên evîna te de dilê xwe cîwar bikim. Hîna ez û xwe nîqaşa me berdewam bû. Dema dengê lerizandina telefonê hate guhên min, vê care ne weke her wext bû, dilsarî û bêzarîyekê ez di nava xwe de dihêrandim ta ku bê hêvî hêştim. Min got dike ku endamekî komîteya ku tê de dixebitim pirsgerêkek pê re çêbûye, ji bo wê jî ji min re lê didin.

Bi gavinê xemsar weke ku diçim ser gora xwe bêmereqîyekê bi gîyana min girtibe, wisa ez çûm jûra ku telefona lê bû ye. Nameya te bangî min dikir pê re jî bêrîkirinê te yê sotî gazî dilîna min dikir. Ta ku yekbûna xwe pê re bîaşkêre û min bike dîlbera jîna xwe. Min vekir telefon û li nameya te meyze kir. Bi pêşwazîkirineke evîndarî dilê te derîyê pêpelokên hezê li pêşîya gavên erêkirinê vekir. Keyana min tev de hejî û girî xwe lê pêşîya bîrewarîya wînda ragihand.

Wê nameye ez ji nû de dam jîyankirin û derîyê dilê xwe ji te re vekir, da ku valahîyên heyî bixetimînî tu, bi hezê.

Name

Nameya te bangî min dîkir pê re jî bêrîkirinên te yên sotî gazî dîlîna min dîkir. Ta ku yekbûna xwe pê re bîaşkêre û min bike dîlbera jîna xwe.



Mufide Koto

Di her dema ku dengê telîfonê dihat de, awirên min ber bi bejna te ve bilind dibûn, hêvîyên min bi dîtina te re difirîn. Heşteke cuda û xweş di dilê min de xwe serax dîkir. Dîsa muzîka te xwe kire ştrana telîfona min û ji min re ştra bendewarîya te ya ku her wext ez ber bi xwe ve dikişandim.

Di nav hevalên xwe de bûm. Telîfona min recifî. Sorbûneke şermînî xwe li ser gulmên min pal da, ber ken bûm. Dilê min di nav lepên te de xwe nazdar dîkir. Herî dawî dengê te, dengê te yê ku bi romantîkbûna peyvên xwe hişê min mişextî xilmatîyê dîkir û ez û heştan ve direqisand ji xwe re. Çênedibû ku carekê bêyî gotina “delakê, hunguvê” axaftina me diqedîya, ji xwe tu car nediqedî, lê belê yekeyên me diqedîyana her wext û xatirê me jê dixwest. Tevî van hemû jîyankirinên heştîyar jî ta niha hasten ku di navbera me de xwe dîkirin perde, hîna bê nan bûn ji xwe tiştê ku ez binax dîkirim jî ew bînavîya bû.

Te got:

- Dîsa tu bi bîdengîyê re nîqaş dikî, ne?
- Na vê carê pêşbînîya te ne di cih de bû.

Dema ku tev bi hev re rûniştî bûn Serokatî derbasî hundur bû û silav da tevan. Roksen bi kelecaneke Serokatî himêz kir. Serokatî jî destê xwe ser serê wê re bir û got vaye keçên me yên ciwan jî hatine. Pişt re Serokatî dest bi civînê kir û civîn 4 saetan berdewam kir. Di civînê de Roksen çavê xwe qet ji ser Serokatî qut ne dikir weha bi heyranîyekê lê temaşe dikir. Mîna ku bersiva tevayî pirsên xwe di wê civînê de digirt weha dilê wê şad dibû. Roksen li milekî bi baldarîyeke pir mezin li gotinên Serokatî guhdar dikir, li milekî din jî ew gotinan di serê xwe de dibir û di anî. Mejîyê Roksen bi gotinên Serokatî dihate neqîşandin û mîna zarokekê rûyê wê geş dibû. Roksen carekê çavê wê li bavê wê ket û dît ku bavê wê jî pir bi baldarî guhdar dike, rûyê bavê xwe cara yekemîn ewqas aram didît.

Piştî ku civîn bi dawî bû, tev bi hev re li gel Serokatî xwarin, xwarin, Serokatî li ser xwarinê jî bi her kesî re di nava dan û stendinê debû. Di dema ku her kes xatir dixwest Roksen weha di cihê xwe de cemidî mabû. Destê wê ji Serokatî û wî cihî nedibû. Roksen çû cem bavê xwe û got: Yabo ez dixwazim tiştêkî ji te re bêjim.

Bavê Roksen li Roksen nerî û destê xwe danî ser milê wê û got: ez zanim tê çî bêje keça min, min jî li vir baştir fêhm kir bê çî di dil û mejîyê te de heye. Roksen bavê xwe bi germa-hiyekê himêz kir û got: Yanî te fêhm kir ez çî dixwazim yabo, ez dixwazim Serokatî herdem himêz bikim. Ez bûme

mîna evîndareke ku evîna xwe wenda kiribe û ji nişkave dîtibe. Ez ê nikarî bim dîrî vê evînê jiyan bikim yabo. Bavê Roksen eniya Roksen maç kir û hêsirên wî yê ku herikîn ser rûyê wî paqij kir. Pişt re jî destê xwe li pişt Roksen da û got: here keça min here, bibe bûka welatê xwe, daweta herî mezin ev e ku mirov di welatê xwe de bi ser bilindahî û ser firazî govend bigre. Roksen di dilê xwe de digot bavê min zanişteke veşartî bû, lê ne wî xwe nas dikir, ne jî derdor wî nas dikirin.

Roksen bi demê re ev rewşa han hîn baştir fam dikir ku li welatê wan jiber ku her tişt hatiye qedexekirin, cewhera mirovên vê xakê her dem veşartî maye, dema ku derfeteke biçûk bi qasî kêlîyan be jî di şert û mercên azad de jiyan dike, wê cewhera xweşik û dewlemend derdixînin holê. Ji bo bavê wê jî ew şert û merc hatibû. Ew kêliya ku li gel Serok APO li raştiya civakî û zextên pergala dagirker yê ku li ser civaka wan kurdan hatine ava kirin guhdar dikir, kûranîya heştên wî û hizrên wî jî zelal dibû. Roksen ji hevalên xwe yê ciwan re dema ku qala van kêliyan dikir û çawa Serokatî bi kelecaneke himêz dikir, ew êdî li çiyayên zagrosê bû û fermandarke li pêş bû. Roksen ji hevalên xwe yê şervan ku piranîya wan nûh bibûn gerîla re got ji wê demê de ez Serokatî himêz dikim û ji himêzkirina wî têr nebûme.

bêje Roksen. biner keça min erê raşt e em gelekî ji APO'çiyên hez dikin, bes piştî ku keça apê te tevî xwe kirin bavê te aciz bû û wan û hevalan dilê hev hiştin. Ev pênc sal ji bo ku em gotina bavê te û ya apê te li erdê nexin em nahêlin ku heval derbasî mala me bibin. Lê em ji APO hez dikin bavê te jî ji APO gelekî hez dike keça min. Bes APO'çî bi aqlê zarokên me dileyzin, ji bo wê em newêrin xwe nêzîkî wan bikin.

Roksen weha li dayika xwe meyze dikir û qet bala wê ne li ser dayika wê bû. Ew ji zaroktiya xwe de gelekî ji hevalan hez dikir û di serê xwe de plana ku hevala bibîne datîne. A dinî rojê Roksen çû mala hevala xwe ji ber dizanî bû ku heval diçine mala wan. Roksen çend rojan ser hevdu çû mala wê hevala xwe heya ku raştî hevalan hat. Dema kete hewşa mala hevala xwe du heval li hewşê runiştî bûn û di nav wan hevalan de hevaleke ku beriya 6 salan li wir xebat kiribû dîsa nû hatibû wê derê, ji bo ku xebatê bimeşîne, çawa Roksen ew dît nas kir, xwe avêtîyê û got: hevala çiçek ma te ez nasnekirin, ez Roksen im. Hevala çiçek Roksen himêz kir û got :wey Roksen ev tu ye, tu çiqasî mezin bû ye, tu hîn weke berê jîre yan na.

Roksen bi hevala çiçek re rûnişt û tevayî meseleyên ku di nava malbata wan û hevalan de qewimî bûn got. Pişt re qala xewna xwe kir, ji hevala çiçek re got ku ew dixwaze bi raştî jî Rêber APO himêz bike. Hevala çiçek lê meyze kir kenîya û got: Roksen ji

xwe em difikirin ku gurubeke tevîhev ji ciwan, mezin û zarokan bişînin gel Serokatî ji bo ku tevî civîna Serokatî bibin. Bes di vê rewşê de destpêkê pêwîste ez malbata te bibînim.

Piştî wê hevdîtînê hevala çiçek çû mala bavê Roksen. Roksen pir dîtirsîya ku bavê wê û dayika wê nebaş nêzîk bibin, lê ecêb mayî ma dema dît ku bavê wê hevala çiçek himêz dike û di heman demê de jî bi henekî dibêje: wele em hevala nahewînin bes em te dihewînin ji ber tu hevaleke me ya kevn î. piştî ku xwarin bi hev re xwarin û çayê bi hev re vexwarin, bavê Roksen û diya Roksen gilî û gazine xwe ji hevala çiçek re kirin hinekî vehesîya bûn. Hevala çiçek jî di şewazê xwe yê îqna kirinê de gelekî jêhatî bû. Wan jî li hevala çiçek guhdar dikirin û gelekî bi hurmet nêzîk dibûn. Hevala çiçek ji bo çûyîna Roksen ya gel Serokatîyê ji wan re got, bavê Roksen li wir got heval ma çênabe ez û wê bi hev re biçin, Roksen jî vê yekê re hîn matmayî ma, qe hêvî ne dikir ku bavê wê weha nêzîk biba ya, di dilê xwe de got: ez zanim bavê min mirovekî nerm e, lê min nizanî bû ku ewqas jî nerm û wê weha bi hesanî haş bibe.

Dayika Roksen jî bi ken got: heval ma ka çênabe em malbat hemû bi hev re herin. tev bi hevdu re kenîyan û sohbeteke gerim di civata wan de dest pê kir. Ji xwe ew roj hevala çiçek li gel wan raza, bi Roksen re jî di nava cîyan de sohbet kirin.

Roksen û bavê xwe piştî hefteyekê tevî 20 kesan çûn şamê mala Serokatî.

dibû. Çi bavê wê çî diya wê dema ku jê re ev gotin digotin Roksen di hindirê xwe de aciz dibû û ji xwe re digot ya rebî ma qey mirov keçik be sûc e yan guneh e. Herdem ev şîretên bi vî rengî serê wê tevlîhev dikir û gelekî pê nexweş dihat. Roksen bi xwe jî ji xwe re xwendin dikir hincet. Ya raştî derdê wê ne xwendin bû, li gel ku di dibistanê de gelekî jîr bû, lê herdem xwe weke xerîbekê didît. Bi taybet dema ku mamosteyan ew hişyar dikirin da ku bi zimanê kurdî neaxivin. Ev yek tê de hîseke bindestîyê ava dikir. Lê dîsa jî ji bo ku ji zextên kevneşopîyên ku li ser keçekê di hundirê malê de tê ferz kirin xelas bibe, derketina ji malê û çûyîna dibistanê hinekî wê vedhesand.

Roksen dema ku gihişte malê, wê carê jî dayika wê deşt pê kir, mîna kasêteke ku tu dubare li heman sitranê guhdar bikî, lê bi dengê hozanên cuda be. Roksen çû odeya xwe li gel her pênc xwişkên xwe, Ji xwe ew keça mezin bû, li kêleka xwişka xwe ya herî biçûk xwe dirêj kir û batanî kişande ser serê xwe.. Xewna wê dihate bîra wê, dixwest ku ji xwe re şîrove bike bê ka ew çî xewn bû, gelekî di bin bandora wê xewnê de mabû, ji xwe hîn jî ji xwe re digot gelo ew xewn bû yan raştî bû, di wê kêliyê de betanî ji ser serê xwe rakir û çavê wê li wêneya ku bi dîwarê li hember wê ve daleqandî bû ket. Roksen ji nişka ve de çeng bû û rûnişt. Ma bû li wêneyê dinerî. Weke ku nû xewna wê di serê wê de zelal dibû û ew kesê ku di xewnê de

dît nas dikir. Di wê kêliyê de dayika wê mîna her car derbasî odeya wan bû ta ku meyze bike bê kes ji zarokên wê ne vedayine ji bo ku wan binixwimîne. Ji ber ku dawîya payîzê bû bi şev serma çêdibû. Dema ku dayika Roksen ket hundir û çav li Roksen bi wê rewşa wêyî ku rûniştî û maye ziq li wêneyê dinere ket di ber xwe de got: bismilleh, keça min Roksen çibûye qey tu razabû û te xewnên ne xweş dîtiye tu weha rabûye rûniştiye.

Roksen li dayika xwe meyze kir û keneke tenik di rûyê wê de xwe da nîşandan. Piştî got: tu zanî dayê îro dema ku ez li holikê di xewde çûbûm min xewneke acêb dît.

Dayika Roksen: xêre keça min ev çî xewin bû, tu bi tenê maye ji bo wê te xewnên nexweş dîtiye û tu tirsîya ye.

Roksen: Na dayê ew bi xwe xewneke xweş bû, lê piştî ku bavê min hat û ez hejandim nexweş bû. Dema ku weha got kenîya û pişt re jî weha berdewam kir: Tu zanî dayê ez bi xwe jî niha nû nû fam dikim bê xewna min çibû. Ma ne ez ji zaroktîya xwe de tim ji bavê xwe re dibêjim ka rojekê em herin şamê ji bo ku Serok APO bibînin, ev mereqa min î ji zaroktî de bû. Îro min ew di xewnê de dît dayê, weha şêrîn weha mirovekî ku xwîna min li ser dikeliya mîna ku ez bi salan wî nas bikim û jê dîr bûm. Min dixwest ez wî himêz bikim bes bavê min nehişt.

Dayika Roksen weha acêb mayî mabû li Roksen dinerî, pişt re jî jê re got: Keça min ev xewin bû ya ti ji xwe re xeyalan çêdike. Çî di serê te de heye

bi xwe tu carî ew nedîtibû, gelo li ku derê ev rû dîtîye, yan dişibîne hinekan, Roksen di milekî de ji xwe dipirsî, her weha gelek îhtîmal di serê xwe de bir û anî, di milekî din de jî li rûyê wî kesî bi rûkenîyeke tenik dimeyzand.

Roksen çû cem wî kesî rûnişt û li çavên wî nerî. Keseke weha bû ku çavî wî mîna sitêrkên asîman diçirisîn, rûyê wî yê li ken tijî hêvî bû, di heman demê de jî awirên wî tûj bûn, lê tubûyîneke ku mirov dixişt nava hizaran de, nava lêgerînê de. Roksen mîna evîndarekê mabû lê temaşe dikir û ji dilê wê dihat ku vî kesî himbêz bike, lê tişteke ku wê asteng dikir hebû, ew tişt çibû bi xwe jî ne yeqîn bû. Roksen biryar da ku vî kesî himbêz bike û pê re biçe cihê ku ew lê ye. tam di kêlîya ku Roksen destê xwe ji hev vedikir mileke din destê xwe davête milê Roksen û ber xwe ve diqşand, Roksen dixwest xwe ji wî destî xelas bike lê nikarî bû ew destê ku wê diqşand ewqas giran û hişk bû ku hema bêje tevayî canê wê ji ber diêşa. Ew destê hişk ku Roksen diqşand di heman demê de wî jî bang lê dikir û digot: Roksen Roksen ka rabe. Roksen bi vî dengê him bi tirs him reben çavê xwe vekir û dît ku hîn li bin sîya holikê razaye, ro diçû ava û dunya jî hêdî hêdî tarî dibû. Destê bavê wê jî li ser milê wê bû û wê dihejand da ku çavê xwe ji xewê veke. Roksen weha acêb mayî li bavê xwe meyze kir bavê wê jî jê re digot: ka rabe keça min tu tenê li vir maye, dayika te got qey tu li pêşîya wan çûye malê, piştî ku em

gihiştin me dît ku tu ne li malê ye, me nas kir ku tu li van deveran di xew de mayî. Ji ber ev ji te re bû ye adet.

Roksen ji milekî de xwe vehesandî hîs dikir ji milekî de jî li ser xewna xwe dihezirî. Bes wê ji xwe re digot ev çi xewneke mîna rastîyê bû. Nema dizanîbû ne xewin didît ne jî rastî bû. Dema ku ji tepeyên biçûk dadiketin bavê wê bi ser de bi rengêkî nermik xwe aciz dikir.

Bavê Roksen: Eybe keça min êdî tu bû ye qîz, tu çawa bi tenê weha li çolan dimînî, di dil xwe de em bi hev re hatin vir û ji bo ku tu hinekî li gel destgirtîyê xwe rûnî em li hev civîyan, te xwe ji nav me kişand û xwe nebedî kir.

Roksen bi hêrsekê bersiv da: Yabo tu çi ji xwe re dibêjî destgirtîyê çi û halê çi, min sed car ji we re gotîye ez mêran nakim, ez dixwazim xwendina xwe temam bikim.

Bavê Roksen: Keça min xwendin bes e, vaye tu niha diçe sefa dehan îsal jî bi dawî bike û bes e, ne gereke keçik ewqasî bixwîne, ma win bixwînin hunê çi bikin. Ji bo zewacê jî me ne gotîye te niha mîr bike, lê herî kêmanîşaneya te mîr çêkin û piştî ku destgirtîyê te eskerîya xwe xelas bike bi xêr wê demê em ê daweta we çêkin, ji xwe wê demê jî ew ê temenê te ji bo zewacê munasib be, bese keçik 18 salî êdî gereke bizewice, tu ne eqes biçûk î jî keça min.

Roksen dît ku çiqas nîqas bike vala ye, ew ê her bavê wê bêje eybe, tu keçik î, ev gotina ku herî zêde jê aciz

de dihezirî. Roksen ji welatê xwe gelekî hez dikir, lê nedixwest weke her keçekê ku di civakê de dijî jiyan bike, serê wê tije pirs bûn, dizanîbû ku tiştekî kêr di jiyana wan de heye, li bavê xwe dinêrî mirovekî belengaz ku di halê xwe de ye, carcaran zû aciz dibe ji çî û ji kê aciz dibe jî nediyar e, lê zû nerm jî dibe û zû li ber mirovan digere, herdem dixebite, geh hemaltîyê dike, geh bi dayika Roksen re diçin zeytûnan didin hev, hema bêje çî karê bedenî têkeve ber wî de dike, lê tim jî xizan bû û bi zorê jiyana wan a rojane diqediya. Tevî vê yekê jî nedixwest ku zarokên wî muhtacî tiştekî bin, çî xwendin be çî jî pêwîstiyên jiyana rojane be ji zarokên xwe re dabîn dikir. Roksen Li dayika xwe dinêrî her çendî tim rûken ba jî lê di çavên wê de şikenandinek heye û xemgînîyeke kûr ku nehatîye ser ziman di mêzandinên wê de serwer bû ye. ev meyzandinên han herdem bala Roksen kişandiye û di giyana wê de êşek daye ava kirin. Roksen ji xwe re digot xwezîya min bikarîba van meyzandinên dayika xwe bida guhertin, lê çawa...wê jî nizanîbû. Li keçikên hevalên xwe yên weke wê di temenên 15 salî de bûn dinerî weke ku daxwazîyeke di dilên wan de heye lê ew jî weke wê bûn, nizanin daxwazîya xwe bi nav bikin didît.

Roksen tevî ku serê wê bi pirsên giran û tevlihev dagirtî bû, lê dîsa jî rûyê wê aram disekinî, di hindirê xwe de ronahîyekê jiyan dikir, cîhaneke xweşik di serê xwe de zindî dikir û

hêdî hêdî ronahîya di hindirê wê de mezin dibû û bersiva pirsên xwe didît. Tam di wê kêliyê de Bi dengekî ku bi navê wê bang dikir ji kûr ve dihat, Roksen ji cîhana wê ya bi tenê derxist, bi çeng rabû rûnişt û li derdora xwe nerî. Çavên wê yên reşî zeytûn î yên mîna darên bajarê wê Efrînê di nava mereqan de li derdora xwe dinerî, ji xwe re digot gelo ev kîye ban min dike. dengekî weha mirov hişyar dikir û sêweke ne ya mîna tirsê, sêweke ku mirov bi cesaret dikir dikşande ber bi xwe de....

Roksen rabû li ser lingê xwe sekinî û li derdora xwe meyze kir, tu kes nedidît, lê deng hîn jî berdewam tê. ew kesê ku bang dikir mîna ku wê nas dike ha dibêje: 'Roksen Roksen keçka delal Roksen ka rabe were xwe bighîne min, ez li vir li benda te me'. Roksen ji xwe re got ka ez ê bi alîyê deng de biçim bê ev kîye weha ban min dike. Roksen li şûna ku di rewşeke weha de bi tenê bi tirsîya û bi guman nêzîk bûba berovajî vê yekê mereqê xwe li dilê wê danî bû û ew deng tê de rehetîyeke bê dudilî ava dikir.

Roksen ji cîyê ku lê xwe dirêj kiribû bi çend gavan dûr ket, dît ku yek li wê derê rûniştîye û bi rûyekî beşûşî li alîyê wê dinere. Roksen şaş ma çawa bû ku ev kes ewqas nêzîkî min bû û dengê weha ji kûr ve dihat! mîna ku di newalekê de bang bike ewqas bi seda dihat!. Li gel vê şaşmayîna xwe jî bê dudilî ber bi wî kesî ve çû. Dema ku gihişte gel wî matmayîna wê zêde bû. Ew kes jê re weke yekî nas dihat, lê

Ji himêzkirina wî têr nebûme

here keça min here, bibe bûka
welatê xwe, daweta herî mezin
ev e ku mirov di welatê xwe de bi
ser bilindahî û ser firazî govend
bigre.



Zinarîn Diyar

Demsal bihar bû, heyva nîsanê
bû, heyva herî ku mirov tê de
xweşîkbûyîna biharê dibîne û bêhna
şînkahiyê dikşîne hinavê xwe. Ez-
man şînahîyeke weha xweşîk mîna ki-
rasekî li xwe kiribû ku mirov ji mey-
zandîna wê têr nabe. Bayekî hênîk û
tenîk her ku li rûyê zarokên vî welatî
dida, aramiyeke mezin di giyanên
wan de ava dikir. Her çendî li ser vî
welatî gelek caran êrîş, talan û wêran
hebû ye jî, lê xweza mîna ku herdem
bi vî welatî re rû li ken be, hêviya ji-
yanê di dilên zarokên wî de şîn dikir.
Mîna ku xwezaya vî welatî li hember
xêrnexwazên ku dixwestin vî welatî
ya bikin yê xwe yan jî tune bikin di

nava berxwedanîyekê de be, geşbûyîna
xwe, herkîna çemên xwe, kulîlkên
rengerang û sekna çiyayên bilind ên ku
çar demsalan bi hev re jîyan dikir berê
xwe dabûne hev. Xweşîkbûyîna vî
xwezayê îlhameke weha dabû komeke
keçên ciwan ku li gel hev rûniştibûn û
li Roksen guhdar dikirin.

Roksen bi bejna xwe ya narîn û
ciwan ku hîn di temenkî biharî de bû,
xwe ji nava qerebalixê kişandibû û li
bin siya holikê de xwe dirêj kiribû,
kezîyên xwe yê reşî dirêj avêtibû pişt
xwe û herdu destên xwe jî xistibûn bin
serê xwe de, çavên xwe girtibûn, bi
rûkenî bê deng mîna ku raketî be, lê
ew bixwe şiyar bû û di nava aramiyekê

ew ê hebûna me jî talan bikin, çimkî hebûna me bi hebûna zimanê me ve girêdayî ye. Zimanê me, me bi jîyanê dide nasîn ji ber ku em bi Kurdîya xwe daxivin yekser me nas dikin em Kurd in lê heger em bi zimanekî din baxivin ew me Kurd nabînin ji ber ku dibêjin heke hûn Kurd in ma çima bi Kurdîya xwe naxivin.

- Dîsa min pirseke kir: Kalo çawa ez ê welatê xwe ji nav lepên dijmin vegerînim û zimanê xwe biparêzim?

- Bersiva te ji min re bi vî rengî bû: Bi zimanê xwe baxive heya ku te ji bona wî êşkence kirin. Bi welatê xwe ve girêdayî be û dest jê ber mede. Girêdana te bi welatê te ve hêza dijmin lawaz dike û li dawîyê ew ê bişkê. Wisa keça min tuyê welatê xwe vegerîni û zimanê xwe biparêzi.

Ez niha nema zarok im kalê min, ez mezin bûme çimkî pir sal derbas bûn. Tu dizanî kalê min ku ez ji zanîngehê ji beşa erdnigarîyê derçûme. Lê çiqas nexşe di zanîngehê de şanî min kirin û hiştin ez wan ezber bikim, lê qet carekê nexşeya Kurdistanê min şanî min nekirin, ji ber ku ew dizanin her nexşeyek ji yên şanî min dikirin parçeyek ji Kurdistanê min xwarîye. Tu dizanî piştî ji zanîngehê derçûm li karêkî hêja gerîyam, lê her ku dizanîn ez Kurd im ji min re digotin karên hêja ne bona Kurda ne.

Kalê min ji ber ku zilm û zor li me mezin û pir bû, lewma min ji bilî rêya qurbanîyê li pêş xwe nedît da ku welatê xwe vegerînim. Min biryar da ez xwe bikim qurban ta zarokên netewa min liştokên wan, ji wan neyên standin ta ku di zarokatîya xwe de bi zilmê hes-

tewar nebin. Min xwest bibim qurban da ku zarokên me ji zimanê xwe neyên bê par nemînin, da ku heştewar nebin ku ew bîyan in li ser xaka welatê xwe. Kalê min ez xwe dikim qurban da ku ji zarokên me re welatê wan vegerînim da ku ji wan re nebêjin hûn bê welat in. Ez xwe dikim qurban da ku setemkarîya ku min di zarokatîya xwe de dîtî bikujim.

Kalo torina te pir bêrîya te kirîye, lê niha ew nikare were ba te, çimkî ew qehreman e û di qadên cengan de şer dike, ji bo pêşerojê ji zarokên netewa xwe re ava bike. Ez bi xwe şanaz im kalê min ji ber ku ez ê jî bibim yek ji qehremanên ku te hertim li ser wan ji min re daxivî û tu bi wan şanaz dibû. Erê kalê min niha min tev hevalên xwe cengek bi dawî kir û em tê de bi ser ketin. Hîn ez ji nivîsandinê hez dikim, lê îcar ez bi Kurdî dinivîsim lewma piştî her cengekê bi alfabaya qurbanîyê çîrokekê ji çîrokîyên zilmê yên hiştinî ez bibim qehreman dinivîsim, di dawîya her çîrokeke setemkarîya li me hatî kirin ez ji gelên cîhanê dipirsim. Em bi we re bi biratî têkilîyan dikin. Çima hûn bi dijmantîya me dikin?

Ez ê bi Silavên ji dil nameya xwe bi dawî bikim. Silavên ji dil ji te û dara zeytûnê re ji dê û bavê xwere dişînim.

Kalê Şemo name bi ramûsanekê bi dawî kir, ew da hev û bangî diya Dilsozê kir û jê re got: Ta xemxwarê welêt û zimanê Kurdî mîna Dilsozê hene, qet xeman nexe, Kurdistan wê ava bibe û qehremana te wê di nav dîrokê de tîrêjeke ronahîyê be.

tenê ew bû ku lîstoka xwe ji çermreşê vegehinim.

Min lîstoka xwe jê stand, lê çermreşê li odeya derîvekirî nerî û dagirî. Hema dengekî qalind ji wê odeyê derket û di guhê min de qîr kir. Bi tîrs min li paş xwe nihêrî, min dît ku rêveber ji wê odeyê derket, hat bi zorê lîstoka min ji nav destê min bir û da çermreşê. Herduyan ez bi girî kirim û bi girî vegevandim polê, di rûnişteka şikeştî de rûniştim. Di ber girî re min digot ez lîstoka xwe dixwezim. Çermreşê dema dengê min bihişt yekser hate polê û bi qerezî min re bi lîstoka min li pêş min lîst, bi dengekî bilind dikenî û digot: Ez ê hemû tiştên te ji te biştînim û wan li pêş te perçe bikim. Wê her kêliyêkê li min dinêhirî, parçeyek ji lîstoka me hildiqetand û dikenî. Min nizanî çima tu kesî li vê malê piştgirîya min nekir.

Bi qedandina nîvê rojê re ez bi çavine ku bi agirê girî sor bûbûn vegehm mal. Dema diya min wisa ez dîtîm ber bi min ve bezîya û ez hembêz kirim. Ji min pirsî çima tu digirî. Min xwest jê re bibêjim ku lîstoka min bi destine kîndar hate nişkekuştin û parçekirin lê girî rêdana axaftinê neda min. Lê diya min dema lîstoka min di destê min de nedît wê ji min pirsî: Ka lîstoka te keça min? Te ew li ku derê hiştîye? Hîngê dengê min hêz ji girî stand û got êdî lîstoka min nema heye.

Hîngê kalê min tu mîna her car li bin dara zeytûnê ya ku te bi destên xwe çandibû û bi xwêdana enîya xwe av dabû rûniştîbûyî û te axaftina me dibihîşt. Dema te dît ez ji bo lîstoka

xwe digirîyam te bangî min kir û got were hembêza min delala min. Ji hembêza diya xwe derketim û bezîyam hembêza te. Destên te yên ku hertim bi axa welêt henekirî bûn di ser serê min re bir û anîn û bi gotinên xwe yên ku ji daraziya jîyanê dagirtî bûn te kir ez ji girî rawestîm. Di hembêza te de hevoka ku rêveberê li pêş deriyê spî ji min re gotibû hate bîra min. Min ew ji te re got da ku tu wateya wê ji min re diyar bikî. Lê dema ku te ji min ev hevok bihişt rûyê te xeniqî, te nefesek kûr kişand û got: Nalet li zemanê ku hiştîye seyda bibin kole û kole jî bibin seyda were. Nalet li zemanê ku qehraman kirine newêrek û newêrek jî kirine qehraman were. Bi xwîna zarokên xwe me bergirîya welatê xwe kir. Niha jî bi qehramanên me xwe vedinin û dibêjin ku ew qehreman ne Kurd bûn.

-Hîngê min ji te pirsî: Kalo ma ne ev welatê me ye? Ma ne tu hertim ji min re dibêji ev der Kurdistana me ye? Ma çima rêveberê wisa ji min re got ku em bê welat in?

-Te li min vegevand û got: Keça min erê em niha bê welat in lê ev welat welatê me ye ji bo wê zarokên me xwîn dane.

Dîsa min ji te pirsî: Kalo çima rêveberê ez ji axaftina bi zimanê min qedexe kirim, ma ne ji mafê min e ku ez bi zimanê xwe biaxivim?

-Te wisa ji min re got: Ji mafê te ye keça min her weha ji mafê her Kurdekî ye ku bi Kurdîya xwe baxive. Lê niha me ji zimanê me qedexe dikin da ku hebûna me tune bikin ji ber ku ew dizanin ger me ji zimanê me bikin



Tabloya- Emîna Hisên

rûniştibû. Li rex wê rûniştim û min lîstoka xwe da pêş xwe da ku her ez li wê binêrim ez bi biyanîya vî cihî hîs nehesim. Mamoşteyê alfabeyeke nû bû ji min re bi lêv dikir min qet nizanî ew alfabe ya kê ye. Lê bi qasî ku mamoşteyê tîpa elêf dubare dikir ez jî hînî lêvkirina vê tîpê bûm. Her weha min ji hemû zarokan baştir ev tîp bi lêv kir, lewma mamoşe ji zarokan xweşt ji min re li çepkan bixin. Lê van çepkan hinek kîndarî ji aliyê zarokan ve ji min re çêkir, nemaze keça çermreş a ku li rex min rûniştibû. Me nîv demjimêr di wê odeyê de derbas kir piştî zengilekî lê da. Min nizanî

ku ev zengil wê qerebalixê di odeyê de çêbike ji bawerîya min bû ku ev zengil mîna zengilê mala me ye herku lê dide ew nîşanîya hatina mêvanan ye, lê li vê mala mezin ne wisa bû ji ber ku lêdana zengil li vir nîşanî derketina ji odeyê dida. Hemû zarok ji polê derketin tenê ez û çermreşê di polê de man. Hema min xweşt bi lîstoka xwe bilîzim çermreşê yekser lîstoka min revand, bi bez ji polê derket û revî. Li pey wê ketim lê ji nişka ve ew li pêş derîyê ku ez û dîya xwe sibehê li hemberê sekinî bûn û dîya min bi rêveberê re daxivî sekinî. Min bala xwe neda ku kî li pişt wî derîyê vekirî bû ji ber ku xema min

ji ser wê hilqetîne û balindeyan di hembêza wê de bifirîne. Her weha her şervanek bi qurbanîya xwe mizgînîyê dide welat û gelê xwe ku rîya rizgarbûn û azadîyê nêz bûye. Kevokeke spî li vir bûye hevala min mîna hevaltîya te û dara zeytûnê. Kevoka min hertim di cengan de bi min re ye û ew tev lêdana çeka min hertim sirûda azadîyê bi dengê xwe lê dide. Nizanim çima di her cengekê de yekemîn rojên min ên di dibîştana seretayî de li bîra min tê. Dema ku dîya min ez birim dibîstanê û ez bi tenê li wir hiştim, lê da ku ez bi tena xwe netirsim wê lîstoka min a ku min pir jê hez dikir li ba min hişt. Hingê dîya min ez radeştî rêvebera dibîstanê kirim û herduyan li pêş min bi zimanekî ku min jê tînedigihîşt bi hev re axivîn. Piştî wê axaftinê dîya min li ser çokên xwe rûnişt da ku dirêjahîya xwe bi qasî ya min bike û ji min re bi zimanê min ê Kurdî yê ku ez jê tîdighêjim got: Keça min delala dilê min destê min berde, bi destê vê rêvebera xwe bigire û bi wê re biçê pola xwe. Min bala xwe da, di dema ku dîya min bi min re bi zimanê min ê Kurdî daxivî ku li ser rûyê rêveberê cureyek ji hêrsbûnê û nerazîbûnê diyar bûye, lê min qet nas nekir ku çima ew nerazîbûn û rûyê tîrş. Hema dîya min xatirê xwe ji me xwest û bi rê ket rêveberê bi destê min bi hêrs girt û nehişt ku tilîyên min xwe ji zîndana destê wê rizgar bikin. Em herdu li pêş derîyekî spî ku li ser peyvek hatibû nivîsîn lê min nizanî ew peyv bixwenda ji ber ku ne bi zimanê min bû sekinîn. Berî em derbasî pişt wî derîyê bibin rêve-

berê bi rûyekî tijî jehir li min nêhirî, tilîyeke xwe ji min re rakir û bi zimanê erebî got: (Înşallah ez te bibînim ku tu li vir bi Kurdî daxivî, ez ê çavên te derxim. Hûn miletek bê welat in, lewma me bi zimanê xwe gêj mekin). Min guh neda wê ne ji hevoka wê ji ber ku min ji herduyan tînegihîşt. Lê min ew hevok di hişê xwe de li ezber kir da ku ger ez vegerim mal ez ê wateya wê ji te bipirsim.

Hingê derî bi hêrs bi destê rêveberê hate vekirin û em herdu derbasî odeyekê bûn. Ode bi zarokên ku bi qasî temenê min bûn dagirtî bû, min nizanî ku çima ew zarok giş di vê odeyê de kom bûne.

Nêrînên çavên min xwe di wê odeyê de rizgar kirin. Her nêrînekê tiştek li ber lepên xwe dixişt. Di wê odeyê de rûnişteke pir bûn di her rûniştekekê de sê zarok rûniştibûn. Mamoştêya ku zarok hîn dikirin, li hember wan zarokan hemîyan sekinî bû, yeke bejin kurt û pir zayîf bû. Ew ji min ve nêz bû xwest ku min di rûnişteka pêşîn de bide rûniştin lê berî ku ez li ser rûnişteka pêşîn rûnim rêvebera rûtirş bi lez berve min hat û ez ji rûniştekekê derxiştim. Ji mamoştêyê re hevokek got min di wê demê de jê tînegihîşt, lê piştî ez hinekî mezin bûm min wateya wê hevokê nas kir. Wê gotibû divê kesên mîna van hertim li paş bin, ji ber ku pêş û pêşketin divê ne ji van re be. Lewma wê ez di rûnişteka paşîn de dam rûnişkandin. Di wê rûnişteka şikeştî de ya ku hin xwendekaran perçeyên wê ji hev kiribûn keçeke porgij, rû û çermreş û lik ji pozê wê dihat

Alfabeya Qurbanîyê



Hind Ebdelo

**alfabeya qurbanîyê alfabeyeke bi
xwînê li ser gêyan hatiye nivîsîn.
Ji bilî şervanan tu kes vê alfabeyê
nizane bi lêv bike yan binivîsîne.**

Nameyek di devê kevokeke spî de bû dema ew hat li ser dara zeytûnê ya ku kalê Şemo li nava mala xwe çandibû venişt. Kalê Şemo di bin wê darê de rûniştibû û wî temenê xwe bi mezinahîya wê darê dipîve. Ew 15 salî bû dema ew dar çand lê niha ew 70 salî ye. Hertim ew ji darê re dibêje ez û tu hevaline dilsoz in bi hev re mezin dibin bê ku Payîz temenê me zer bike. Kevokê dema nas kir ev kalê Şemo ye wê name ji devê xwe gêre nav destê wî kir û firî. Kalê Şemo name di nav destê xwe de gerand, di vê gerandinê de dît li ser nameyê bi Kurdî hatiye nivîsîn: Nevîya te Dilsoz pir bêriya te kiriye. Dema wî ev hevok xwend ramûsanek li ser navê Dilsozê nîgar kir, bi şahîyekê rûyê xwe şûşt, berkenî bû û name vekir. Bi dilekî ku

bi bêrikirinê mişt bû name xwend:

Kalê min ji her kesekî re alfabeyeke taybat bi wî heye ev alfabe ne girêdayî netewekê, miletekî yan welatekî ye, lê ev alfabe bi heştên her kesekî ve girêdayî ye, lewma nav li vê alfabeyê bûye alfabeya heştan. Her heştêk di kesayetîya mirov de alfabeyek e. Alfabeya bav û dîyan alfabeya dilovanîyê ye. Alfabeya dildar û evîndaran alfabeya evînê ye. Lê alfabeya qurbanîyê alfabeyeke bi xwînê li ser gêyan hatiye nivîsîn. Ji bilî şervanan tu kes vê alfabeyê nizane bi lêv bike yan binivîsîne. Bi vê navnîşanê nevîya te Dilsoz ya niha şervan e nameyekê ji te re dinivîse û ew ê wê ji te re bi kevokekê re bi rê bike.

Kalê min berbang xweş e çimkî ew mizgînîyê dide ezmên ku dê roj tarîyê



Tabloya- Roşan Sîno

dibûn, Gulê ji rewşa sancîyan de naskir ku ew ê êdî zaroka xwe deyne, rûliken bû û got:

Aferim kurê min, min dizanîbû ku tu yê qebûl nekî ku zayîna te ne li ser xaka te be, aferim kurê min ez bawer bûm ku tu yê li ser xaka pîroz qîrîna azadîyê bankî.

Her ku dice sancî û dengê topan giran dibe û erd di bin Gulê de dihejîya, Gulê li kurê xwe vegeşîya û got: Te dît kurê min tu hîn nehtî ye vê jiyanê ew ji te ditirsîn, nema dizanîn çawa rê li ber hatina te bigirin.

Bi yek qêrîn û yek dengî wî zarokî ji topbaranê re got na û hat vê jiyanê.

Gulê; kirasê xwe danî û li kurê xwe pêcand, geh bi ken û geh bi girî ew

zarok mac dikir, li çavên wî yên ku hîn li jiyanê venekitine nihêrî û got:

Tu bi xêr hatî vê jiyanê Çolo, erê berxê min nave te Çolo ye, tu li vê çolê hatî tu yê nave wê ji rakî.

Gulê kurê xwe mac kir û bêhnek dirij kişand, rewşa wê nebaş bû xwîna wê diherikî, gotina xwe berdewam kir:

Qet metirse kurê min tu di siya dara zeytûnê de yî, ew ê tim û tim te biparêze ta ku reha wê di Efrîna rengîn de be ew ê te biparêze, lê dema tu mezin bibî tu yê bi xwîna xwe wê biparêzî wekî ku ez niha xwîna xwe didim te.

Hêdî hêdî Gulê ji deşt xwe çû, giyanê wê yê pîroz tevlî çiçekên buharê bûn. Çolo, dara zeytûnê û Efrîn bi tena xwe man û man.

Çolo



Narîman Evdikê

**Qet metirse kurê min tu di siya
dara zeytûnê de yî, ew ê tim û tim
te biparêze ta ku reha wê di Efrîna
rengîn de be ew ê te biparêze..**

Dûman bi ser gundê Gulê ket ...
Şev li wan nebû sibeh xewa
wê şevê nîvço ma, dewran li ser wî
gundî gerîya û ji neçarî Gula ducanî
berê xwe da çolan. Dema ku ji gund
derketin hemû gundî bihev re bûn, lê
ji dengê topan û dûmana pir hew Gulê
tenê xwe li wan çolan dît.

Gav bi gav Gulê dizanîbû ku dûrî
gund dikeve, lewma gavên wê bi
bêbawerî û sist bûn û bi xwe re digot:
Ev gavên mirinê ne.

Hawar xweda çima lingên min
dimeşin û hîn dilê min lî paş maye,
hawar xweda ez ê çawa dev ji buhişt
xwe berdim... Hawar xweda, ez ê
zaroka xwe li kur û bi çî halî bînim,
ew ê çavên xwe li ser çî veke.

Gulê nema dizanîbû bersiva xwe
bide û ne jî kes hebû bersiva wê bide.
Wax li min bi buhara xwe şad nebûn,

hingî buhara vî gundî xweş bû xwedê
jî dixwaşt dakeve û li wir jîyan bike,
lê heger ku ew were vir, êdî ew ê baw-
erîya kê bi buhişt wî ya ne buhişt
were.

Gotin û pirsên wisa di sere Gulê de
diçûn û dihatin ta ku çiçekên buharê
bi giyanê wê kirt û gazinc jê kir ku ew
bi kude diçe û vê xaka pîroz ji kê re
dihêle û çima wan sêwî dike.

Gulê ji qudûm ket û nema dikarîbû
rabaya ser xwe, li zikê xwe niherî hate
bîra wê ku ew ducanî ye û dem dema
hatina vî zarokî ye, sancîyan dest pê
kir yek dûv yekî bê navber.

Gulê hêdî hêdî xwe gihande darekê
û piştî xwe dayê, çavên xwe yên
zeytûnî vekir û li şaxên darê nerî û got:

Ez bawer im ku ne bitenê me û tu
yê piştî min bigrî.

Sancîyên wê her diçû dijwartir

Nivîskarê Min

**Ka ez ê bê te çawa bijîm, bê te evîn nayê nivîsandin?!
Dema wisa digot dêmên min sor dibûn û min rûpel jê re dixemilandin.**



Mîdiye Berekat

Iro mîna sêwîyekê li vê malê dijîm, duh ez ketim xortekî ez ji erdê rakirim û ez anîm vî cihî.

Destpêka evîna min bi nivîskarekî bû, ez pir û pir delal dikirim. Her şev piştî kombûna xeyal, heşt û ramanan dest davête nava min û me bi hev re semaya peyv û helbestan dikir... Carinan di nivê helbestê de ez radimûsan-dim û ji min re digot:

- Ka ez ê bê te çawa bijîm, bê te evîn nayê nivîsandin?!

Dema wisa digot dêmên min sor dibûn û min rûpel jê re dixemilandin.

Belê ta duh bi sibê ez wisa pê re di nav evîn û cihekî bilind de dijîm, lê gava duh ji mal derket ez wek gulekê di ber berîka xwe re kirim û kêfa min çiqas hat. Nivîskarê min dixwest ku biçe pirtûkxweneya bajêr ta ku çend pirtûkan bîne.

Dema ew dimeşî kevirekî neçê ber lingên wî derket nivîskar lê vekulimî

û ez ji berîka wî ketim. Min xwest xwe bavêjim hembêza wî lê ew rabû ser xwe, ez nedim û piştî xwe da min û çû.

Min kir hawar, qêrîn û gazî. Min bang kir:

- Dilo, nivîskaro li min veger te ez li şûn xwe hîştim.

Lê dengê min qet neghîştê. Piştî ku ew li pêş çavên min winda bû min xwest li nav çawîrê an di paş kevirekî de xwe veşêrim ta ku kesekî nezan min nebîne û nebim dilê nezanîyê.

Piştî demeke kurt kesekî ez dîtîm û bê nazikî ez rakirim û got:

- Min pênuşek dît, ka ez ê ji xwe re bibim mal.

Belê ji duh ta niha ez bê kar mame, çiqas bêrîya nivîskarê xwe dikim.

Nezanî û nexwendina vê malê wê bibe bela serê min, lewra ez ê xwe bavêjim erdê yan bimrim an jî raştî kesekî zane werim.

Gulê: Ez ê li vir li benda te bim heya tu vedigerî.

Bav: Ez ê werim, û bi soz ez ê ji ter bînim.

Gulê: Ez ji vir narim heya tu bê bavo.

(Bav diçe û zîlan rûdinê li hêvîya wî dimîne û şer çêdibe)

Dayik: (Bang dike) zîlan ... birve keça min... bireve.

Gulê: Çi bûye dayê?

Dayik: Mala me xerabû mala me talan bû.

Gulê: (Bitirs) çi bû yadê? kê mala me talan kir?

Dayik: Yên rihdirêj û nig qelişî, rabe bi lez em birevin.

Gulê: Ez nayêm wê bavê min were.

Dayik: Bavê te nema tê rê hemû girtin.

Zîlan: (Biqehir) naaaa ez nayim, ez nayêm wê bavê min were, wê ji min re kirasekî bîne.

Dayik: Keça min qurban bimeşe em ê herin bavê te ne ma dikare were.

Gulê: Na tu ne raşt dibêjî, bavê min soz da min got ez ê bêm, wê ji min re kirasekî kesk û sor û zer bîne, wî ji minre got.

Dayik: (Destê wê digre û dikişîne) keçê nayê bimeşe.

Gulê: Na wê bê...

(Dengê girîyê zarokekî biçûk tê dayik direve)

Dayik: Birayê te digirî.

Gulê: Erê here here ez ê li vir li hêvîya bavê xwe bim.

(Du kes derbas dibin pêxwas û rihdirêj)

Zîlam 1: Tu çima ne revîyayî ha..

Gulê: Wê bavê min bê.

Zîlam 2: (Dikene) bavê te nayê me rêya wî jê sitand.

Gulê: Na tu ne raşt dibêjî wê bavê min bê û wê ji min ra kirasekî kesk, sor û zer bîne.

Zîlam: Nayê.

Gulê: Na wê bê..

(Herdu zîlam bi destê wê digirin û serê wê dadixînin)

Gulê: (Bi qîrîneke bilind) bavoooooooo...

Dike tarî dibe



dixwazî ez ê ji te re bînim.

Gulê: Kirasekî kesk, sor û zer û pêlavekê nû ez dixwazim ji bo cejna qurbanê û Newrozê.

Bav: (Xemgîn dibe) lê keça min buhayê wan bi min re tune ye, ma li bajêr rehmê li hev nakin xwîna hev dimêjin bi vê buhabûnê.

Gulê: Ji bo xwedê ji min re bikire, ev du sal derbas bûn te ji min re nekirîy

Bav: Xemgîn nebe û bes van rondikan bibarîne, ez ê agir bi dinîyê xînin ji bo te.

Gulê: Tê ji min re bikire.

Bav: Erê ..erê

Gulê: (Bikêf) xwedê dilê te xweş bike û temnê te dirêêêêj bike.

Bav: (Dikene) hhhhhh dê her çend berxan hazirke ez ê wan bifroşim ji bo xatirê çavên te.

Gulê: ohhoo min ji sibehê de wan amadekirine li pêşîya te ne.

Bav: Hhhh yanî te zanîbû.

Gulê: Bavê min dilê min e, nahêle ez xemgîn bibim lê tu ji bîr neke kiras bila rengê alê be ha û pêlavek.

Bav: Temam ji herdû çavên xwe ez ê ji te re bînim.

Wê bavê min bê



Fatma Ehmed

bavê min soz da min got ez
ê bêm, wê ji min re kirasekî
kesk û sor û zer bîne, wî ji
minre got.

(Bexçeyek, dikeyeke ji bo rûniştinê, sênîk û qedehên çayê)

Gulê: Yabo ma tê kengî biçî bajêr?

Bav: Oho, dinya zivîstane û rêya gundê me pir dijware, çûna min niha tune ye.

Gulê: Ji bo xwedê here bajêr yabo.

Bav: Him, ti ne ji bo xwedê dibêje, de ka bêje tu çi dixazî ji bajêr.

Gulê: Bi rastî bavê delal va cejina qurbanê hat û Newroz jî li dû ye.


Bav: Ê... baş e xwedê bi xêr û xweşîyê derbas bike keça min.

Gulê : Aaaamîîn

Bav: Hîn te negotîye tu çi dixwazî ji bajêr?

Gulê: (Dev li ken) ez ê bêjim, yabo ma ez her sibe ji ter taştê çênakim û dermanê te nadim te, heya di êmkirin û avdana pez de jî ez alîkarîya te dikim.

Bav: Belê rast e, xwedê ji te razî be, tu ronîya çavê min î ka bêje tu çi



Herî dawî civînek hat lidarxistin, sê riba xelkên bajêr lê hazir bûn, kesên zimandirêj û dengqebe galgalên wekî “kulî hîç in, kulî gêj in” gotin.

Dema zilamekî bi zimanlûsîya xwe bi navûdeng bû xwe amade kir biaxive, çepikine germ jê re hatin lihevxiştin, bi rijid û israr got: Heger em bixwazin bi ser bikevin divê em bizanibin çima kulî hatine bajarê me.

Ji bo vê pêşnîyarê gengeşe bikin her kesî hewil da bi dengê bilind nêrîna xwe bide pêş.

Xelkên bajêr bûn du beş, beşek dibêje: Ji ber em hêjayî vê sizayê ne kulî hatine bajarê me û beşê dî dibêje: Dema ba digere kulîyan bi xwe re digerin.

Hê wisa ew nîqaş dikirin û her kes ji wan heya jê dihat hewil dide ku nerîna xwe ya rast bide xwîyakirin, kulîyan da ser wan.

Kulîyan, bajar û zevîyên wê dagir kir û heya gîya, genim û pelên daran nexwarin û bajêr ji reng dernexistin, neçûn.

Heta ku haya xelkê ji xerabî û qiriktalîya bi serê bajarê wan de hatîye bûn, derbê cihê xwe girt.

Lê di heman demê de kêfxweş û serbilind bûn, dawîya dawî bi hev re gihan tifaqê ku tiştê ew dikin hêjaye kulî bigirin ser wan û ev yek jî di bafîka gera ba de pêk tê.


Piştî demeke kurt, xwarin nema peyda bû, bejna xelkê ji birçîna ziraf bû, nexweşîyê girt ser wan û mirinê konê xwe li bajêr vegirt, lê tevî vê jî axaftin û galgal betal nebû û bi serberzî jî ev yek dikirin.

Heya gihan tifaqê hasil giha Mûsil



Zekereya Tamir

Wergera Ji zimanê Erebî: Hemrîn Osman



Cilûberg ji bo şervanan hatin çêkirin, heyv daket erdê, li ser dîwaran bi kilspîyê axaftinên beredayî û sixêf li ser kulîyan hatin nivîsandin.

werger

Dibêjin zemanê berê bajarek xwedî çem û zevî hebû, ne birçîbûn ne jî xemgînî nas nedikirin, lê xelkên wê ji gotin û gotinokan hez dikirin.

Kirin kêmbû, lê galgalok pir bûn.

Rojekê ji rojan zilamek li serê çiyê dijî, berê xwe da bajêr û ew agadar kirin ku wî çav hejmareke mezin ji kulîyan kirîye ber bi bajarê wan ve tî.

Xelkên bajêr spasîya wî li ser hişyarkirina ji bo xetera li ser bajar kir.

Xelkê deşt bi amadekarîyên xwe kir ku beramberî kulîyan rabin.

Ji bo dev bavêjin kulîyan û gefan li wan bixwin helbestevanan helbest rêsîn.

Dengbêjan stran avêtin ser pîrozîya hêza bajêr û nerazîbûna xwe bi hatina kulîyan nîşan didan.

Di lêveger û pirtûkên pîroz û kevin de li çesipandinên misogerîya têkşikestinên kulîyan gerîyan.

Cilûberg ji bo şervanan hatin çêkirin, heyv daket erdê, li ser dîwaran bi kilspîyê axaftinên beredayî û sixêf li ser kulîyan hatin nivîsandin.

Jin xwedî roleke giring û berbiçav e di wêjeya kurdî ya devokî de, bû sedem ku tîrêja têkoşîna jinê were xuyakirin û ya herî berbiçav ew e cihê jinê di civakê de, jiber wilo em dikarin cih û asta ku jin tê de dijî di gelek destanên kurdî de bibînin û baş fêhm bikin, mînak jin di van destanan hemîyan de heye:

1-Mem û Zîn

2-Sîyamend û Xecê

3-Şêxê Sîsabanî

4-Derwêş û Edûlê

5-Binefşa Narîn û Cembelîyê

Hekarî

6-Xana lepzêrîn kela Dimdimê

7-Zembîlfiroş

8-Memê Alan

9-Destana Şêxê Senan

Di van destanan hemîyan de nav, deng û bêjeyên jinê hene, her wiha rewşa jinê baş tê xuyakirin, di heman demê de gelek destanên ku negihane destên me hene yên ku ketin bin desteserîya osmanîyan de û hatin wendakirin ta ku deng û rengê jinê û gîyanê civaka azad neghêje me.

Dema ku dîroka mirovahîyê berê xwe dide tundî û şaştiya dîrokî sedem ew e ku jin bê rol maye di dîroka civakên mirovahîyê de, ne ji vê sedemê ba wê pênaseyeke rast ji wêjeyeke rast re heba.

Ta ku ev pênase lawaz bimîne her rengên lîstokan bikar anîn ta ku hebûna paşmayîyên jinê wenda bikin, ev pîrsgirêk ne tenê ji bo wêje, ji ber wêje ew pênaseya rast e û jîyana ku hatîye jîyan kirin bixwe ye.

Ger ta vê astê rola jinê jê hatîye standin dihêle ku em rewşa jinê bi awayekî zelak nas bikin û heger ne wilo be, kî mîna jinê dikare cîhana aşopên xwe derbirîn bike.

Di heman demê de divê pênaseya xwezaya destpêkê û tîkiliyên wê bi xwezaya duyem re bi zimanê jinê yê wêjeyî were pênase kirin û vedenga wê bighêje gîyan û dilê civakê, heger ti pêşketin di wêjeya devokî de çenebûye nayê wateya ku jinê barê vî erkî ranekirye, jiber desthilatdarî û pergala zegotan herî zêde desthilatdarî li ser dîroka jinê kirye. Ta niha em bi jinên nivîskar ên ku rola xwe di raperînên civakî de lîstine dibihîzin, çimkî jîyana jinê ya civakî hîn nehatîye nîvsandin û rola wê di wêjeya nivîskî de hîn jî wek ku tê xwestin pêşneketîye, wêje di raman, gîyan û heştên jinê de di asteke lawaz de maye.

Wê di roja me ya îro de zengînîya jîyanê bi wêjeya jinê re pêş bikeve, ji dayika Tûrêza Hewramanî ya ku cihekî berbiçav di nav nivîskarên wêjeyê de girt, ta gelek ji jinên kurd ên ku rola xwe di wêjeya nivîskî de lîstin û paşmayîyeke mezin ta niha li pey xwe hiştin tevî hemû berhemên wan yên wêjeyî yê ku di dema dagirkerîyê de hatin wenda kirin. Ji dema mîtolojîyê ta niha deng û rengê jinê bi predeya şeva reş hatîye pêçan, di rêya çend malikên helbestên jinê re em dikarin rewşa jinê ya civakî û asta desthilatdarîyê û zordarîyê nas bikin û fêhm bikin.

xwe dicivand, lewre dema em dibînin ku dayik ştranan ji zarokên xwe re vedibêjin ew bixwe wêje ye û ne dûrî xwezayê ye. Heman yekê em di aheng û xemgînîyan de dibînin, jin xwedîya wê hêza ku dizane bûyer di kîjan qonaxê de bû. Gelek serpêhatîyên dengî û bêrikirinê vedigerin ji jinê re, ji ber dikare pênaseya kul, Keder, kêf û xweşîkbûna jîyanê bide.

Wêje bû sedem ku mirov paraştina jîyana xwe ya civakî bike, ji ber ku bi aşop û ramanên mirov ve girêdayî ye, jinê bi nazikîya heştên xwe karîbû xweşîkbûna jîyanê ji civakê re veguhêze. Heger em bêjin ku mirov xwe bi rêya aşop û ramanan derbirin dike û pêşkêşî cîhana mirovan dike û yê ku mirov ber bi xweşîkbûnê ve dibe ew cîhana aşop ya mirov e, lewre nabe em tenê ji van kesên ku nivîsandin û hatin naskirin re bêjin wêjevanên ku wêje nivîsandine û ti rola jinê tê de tune, ji ber ku herikîna kanîya mirovahiyê û dîroka wê bi wêje hat naskirin.

wêje xwedî têkilîyeke xurt an jî roleke girîng e di pêşveçûna mirovahiyê de, heger ne ji cîhana veşartî ya aşopa mirov ba, mirov nikarîbû aşop, hêvî û ramnên xwe ji bo pêşketin û xizmeta civak û mirovahiyê bi kar anîba. Dema ku em têkilîya jinê bi wêjeyê re bixwînin û lêkolîn bikin, divê em rola jinê ji destpêkê ta vê qonaxê şîrove bikin, ew jî berdewamîya rola wê di wêjeyê de ye.

Di rêya vegotina wêjeyê re jinê dikarîbû bibe hunermend û civakê li

derdora xwe bicivîne.

Herdem jinê xweşîkbûna jîyanê bi zimanê wêjeyê ji nifşekî veguheştîye nifşekî din, zimanê jinê yê jîyanî derbirîna çalakîya jinê bi zimanê wêjeyê û paraştina berdewamîya wê dike, ji ber ku nûnertîya bingeha civakbûyîne dike, tê wateya ku xwe bi wêjeke bedew dide nasîn. Ta ku jîyaneke xweşîk hebe, di her parçeyekî jîyanê de rengê xwe muhir kirîye, wek dema em dibêjin jîyan bê xweşîkbûn nabe, her wiha wêje bê jinê nabe. Dema ku em dibêjin xweşîkbûn divê destpêkê xweşîkbûna jîyanê bê bîra mirov û wateyê bidin wê.

Çi têkilîya jinê bi wêjeyê re heye? an jî rola jinê di wêjeyê de çi ye?

Mînak em li beramber cîhaneke mezin û fireh in, lê em bi çavekî piçûk dibînin, mîna ku civak bê jinê nabe civak, jiber vê yekê rola jinê di wêjeyê de nola rola wê di malbat û civakê de ye.

Giringîya rola jinê di wêjeyê de bi qasî giringîya hebûna wê ye, ji ber pênaseya jinê ji kesayet û hebûna wê dê bi wêjeyê be.

Heger pênaseya pêşveçûna civakê bi wêjeyê be, wê jin bi awayekî berfirehtir pênase bike û rola herî giring li ser milê jinê ye, dema jin bi rola xwe di wêjeyê de ranebe wê demê wê wenda û jibîr bibe, di heman demê de wê dîroka hebûna civakbûyîna jinê wenda bibe.

Ta ku jin têkoşîna jîyana azad bike divê barê wêje yê herî giring bigre ser milê xwe.

Rola jinê di wêjeyê de

Rola jinê di wêjeyê de bi qasî rola wê di jîyanê û pênaseya wê ji jîyanê re ye.



Fehîma Deştan

Wergera ji Erebî: Şînda Abê



Wêje ew hunera bi qonaxên xwezaya mirov re pêş ket û di rêya vê hunerê re xweşîkbûna jîyana xwe derbirîn dikir.

Wêje rengê an jî axaftineke ku bûyerên dîroka çand, jîyana mirovahîyê û civakan vediguhêze, lewre mirovahîyê di rêya axaftin û pexşana wêjeyî re ew nîrx û destkeftîyên xwe parastin, lê rola jinê di wêjeyê de bi qasî rola wê di jîyanê de û pênaseya wê ji jîyanê re bû.

Ji gavên civakê yên despêkê ta roja me ya îro rola jinê di parastina nîrxên civakê de bê sînor e, giringîya rola jinê di wêjeyê de jî weke giringîya rola wê di jîyana civakî de bû, ji ber bêtî wêjeyê ti pêşketin û pêşveçûn di

jîyana civakî de çênabin.

Dema em tenê belgeyên nivîskî pêşkêş bikin, em ê bibînin ku dîroka berxwedan û têkoşîna mirovahîyê ji bo birêvebirin û pêşketina jîyanê di têkoşîn û karekî berdewam de bû.

herdem cihê jinê di rêza pêşî de bû, ji ber vê rola jinê di wêje û her alîyên civakê de herdem parastin û xweşikirina jîyanê bû, ji berî zayênê bi 1000 salî ve ta niha em wan destanên ku bi zimanê jinê hatine nivîsandin dibînin, xwedawendeya jinê di wan destanan de bi awayekî zelal û berbiçav e.

Heger em di dîrokê de paşde vegerin, em ê wê hêza jinê ya moralî bibînin û ew bû ya ku civak li derdora



Navê pirtûkê: Berxwedaniştan

Nivîskar: Mîdiya Berekat

Naverok: Roman


Çiyayê Kurmênc -Efrîn jîniştana Efrîniyan
bû... Landika şariştanî, mirovatî, zanîn û
wekheviyê bû. Warê zeytûn, guvîj, henar
û raştiya jiyanê bû... Pênc salan sirûda Ey
Reqîb û zimanê Kurdî li ser zimanê şagirt
û xwendekaran li dibiştan û zanîngehê
bilind dibû...

Neyarên dilbikîn, mejîtarî û ne mirovane
xwestin bihuştê bikin dojah, ji ber ku
dijmirov û dijşariştanî ne. Ku li kû bin
tarîmejî kujerên jiyanê ne bêguman. Li
hember neyar û terorîstiyê “Berxwedan
Jiyan e”. Pêncî û heyşt rojan Çiyayê Kur-
mênc -Efrîn berxwedaniştan bû û hîn jî
pêlvedanên berxwedanê ranewestî ne, ne
jî dê rawestî.

Hijmara rûpelan: 172

Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2019

Pirtûkên derkef



Navê Pirtûkê: Efrîn Name

Nivîskar: Zozan Mihemed

Naverok: Roman

Hijmara Rûpelan: 282

Ji Weşanên Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2019

Navê Pirtûkê: Berberoj (Birîndaên ber bi rojê
ve diçin)

Nivîskar: Narîman Evdikê

Naverok: pirtûka behsa çîrok , serpêhatî û
bîranînê çend şervanên azadiyê ku di pêvajoya
cenga Serê Kaniyê de li dijî komin çetan de
birîndar bûne dike. Di van bîranînan de heqîqe-
ta evîna rast, mêraniya ku temen jêre ne tiştek
tê xwiyakirin, ji van zêdetir jî tê xwiyakirin ku
welat çawa ava dibin, şer çawa peyda dibin,
lehengî çawa di qadên şer de û di deverên
teng de derdikevin û bi destê ciwanekî yan
ciwanekê.

Hijmara Rûpelan: 124

Ji Weşanên Komîteya Wêje Ya Rojavayê
Kurdistanê

Weşanxaneyê Şilêr - Qamişlo 2019



Navê pirtûkê: Pencereyên Êşê


Nivîskar: Vejîna kurd

Naverok: Kurteçîrok

Di hundir pirtûkê de 37 pencereyên êşê
hene.. hin bi ser birîna Efrînê ya teze de
vekirî ne. Yê din jî roniyekê didin civaka
kurdî û bi taybetî rewşa jîna kurd û pirs-
girêkên wê.

Hijmara rûpelan: 107

Ji Weşanên dezgeha SerSera/ Elmaniya -
2019



Pirtûkên derketî



Navê pirtûkê: Jiyana Min Her Tim Şer
Bû- BERGA 3

Naverok :Nirxên kesane

Nivîskar: Sakîne Cansiz

Hijmara rûpelan: 396

Weşanên Akademiya Jina Azad


A Zeynep Kinaci

Çapa Yekemîn : Çapxaneya Azadî 2015

Çapa Duyemîn : Weşanxaneya Şilêr -

Qamişlo 2017

Pirtûkên derketî



Navê Pirtûkê: Xewnên Biêş

Nivîskar: Dîrok Dîlovan

Naverok: , di pirtûka de Ş.Dîrok behsa
bîranînên xwe dike, ew bîranîn li ser jiyana,
malbat, çiya û vegera wê ji çiyê û caran
behsa aştengiyên nexweşiya xwe dike û ber-
hevkarên bi awayekî sade û estetîk ev bîranîn
li hev anîne.

Berhevkin: Botan Hose - Narîman Evdikê

Hijmara Rûpelan: 170

Ji Weşanên Komîteya Wêje Ya Rojavayê

Kurdiştanê

Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2018

tirîn komên muzîkê di berhema xwe de pêşkêş dike. Koma Kamkaran a ji heft bira û xwişkekê pêk tê. Gelek şahî li ser asta navdewletî li dar xistine û bi taybetî li Berîtanyayê. Bi stranên xwe yên sofî û folklorî navdar in. Li vir em dibînin Bextyar bi zana-bûn ev kom bijartîye hem ji ber muzîk parçeke xwezaya civaka kurdî û hem folklor hêmaneke jîwarîya cadûyî ye.

Bidawîkirina romanê bi vî awayê seyr, belkî dixwest tenî ji bo biçesipîne ku jîyan ne bi rengêkî rasterast dimeşe, belam weke xeleka ku li hev dizivire û destpêk û dawîya wê ne dîyar e.

Jîwarî û Cadûyî di Romanê de:

Der û dem li nik Bextyar dîyar in, bûyrên dîrokî yên şênber tune û her wiha tu navên rastîn yên siyasatmedaran, lê dîsan jî kesayet bi xwe çîrok bûn.

Di rêya cadûyê re roman dihêle em bi awayekî bêalî jîyana şênber bibînin ku hema hema ev jîngeha cadûyî hinekî reştarîya rastîyê sivik dike. Eger Bextyar vegotina cadûyî nerikandiba û xwe nesparta çîrokên gelêrî yên nîgaşî dê roman sar ba, ziwa ba û dê rastîya di hindirê cadûyê de veşartî, nehatiba raxistîn li ber çavan, çimkî çîstê cadûyî bi xwe balkêşîyekê dide bûyeran.

Jîyan û cîhana her du keçan cîhaneke di navbera jîwarî û cadûyî de diçû û dihat. Rengeke ecêb dabûn romanê, nemaze ew bi tenê hêmanên jinane bûn tê de. Nola çawa Marquez bi rêya şêwazê xwe yê tinaz karîbû tarîbûna romana xwe bikuje

ku rexnevanan der barê vê yekê de gotîye: “Marquez cîhana xwe ya bêmîrê pir xweşik kirîye.” Bextyar jî di rêya van firîşteyan re atomesfera berhemê rengîn kirîye.

Derûdor pir wesf nedaye, belam hiştîye ev yek di hûrguliyên kirarên kesayetên wî re derkeve.

Ne tenê cadû di jîyana keçan de bi kar anîye, lê belê cîhana Mihemedê Dilşûşe jî para xwe jê birîye.

Di dimenke lehîyê de gava Dilşûşe bi ser avê dikeve û pê re dihereke gelo çima bask jê re çênêkirin an çima qûm lê nebarand? Çawa ev sirûş di hindirê mejîyê nivîskar de lûsîya? Helbet bersiv belî ye, pir belî ye.. çî ku ew kurê jîngeha xwe ye, kurê Mezopotamyayê ye û gelo çima lehî, ew jî heman bersiv e, yekser lehîya pêxember Nûh dengê wê di serî de olan dide, ev jî tam li Kurdiştanê çêbû, ne li devereke din.

Di hevpeyvînekê de bi yek ji wergêrên vê romanê bo erebîyê Eb-dela Şêxo re got: “Cadû gelekî di folklorê de hatiye bikaranîn, lê ev yek di romana kurdî bi giştî de nehatiye erkdarkirin, lê Bextyar karîbû vê yekê bi kar bîne.”

Xwespartina li efsaneyan yek ji taybetîyên jîwarîya cadûyî ye weke çawa Murakami xwe spartîye efsaneyên yonanî wek a Odîb û bi rengêkî nûjen di hindirê romana xwe de vejandîye, Bextyar jî dara hinarê girtîye dest û bi awayekî rûhanî çel lê kirîye ku nêzî rihê rojhilatî bi giştî û rihê olî bi taybetî ye.



yek ji taybetîyên roman û nivîskarê serkeftî ye.

Hejmar jî di romanê de mijareke din e, em dibînin nivîskar heftê û şeş caran hejmara (bîst û yek) salî gotîye... tiştê belî li ber çavan dema şerê navxweyî yê li başûrê welat destnîşan dike. Lê tiştê din ê nepen an tiştê dixwest bibêje bi taybetî ku ne carekê û duwan gotîye, belkî dixwest bi vê dubarekirinê re bibêje ku gelek weke van bîst û yek salan bi ser me de hatine.

Hejmara sisyan jî baş di romanê de hat dîtin. Sê seryas û sê hinarên şûşeyî.

Di lêkolînekê ya stêrnasê mexribî yê bi navê Ebdulezîz Elxetabî de hatîye gotin: “Di çîrokên folklora kurdî de her tim em pergî sê hejmaran tên 3, 7, 40 û dibîne ev hejmar ne korfelaqî ne, lê belê xwe dispêrin komek bîr û bawerîyên kevin. Ji bo hejmara sisyan dibêje ew di piranîya

çîrokan de bi kar tê da hejmara sê kurikan destnîşan bike û kurê sisyan her tim ê herî baş e, her wiha di çîroka Memê Alan û Mem û Zînê jî de ev hejmar pir hatîye bikaranîn [....] nimûne: sê perî, sê bira, sê mîr, [....] her wekî di stranan de jî hejmara sisyan pir tê bikaranîn [....]”*

Bextiyar di cihekî de dibe qurbana nezaniya gelê xwe gava rêberê Seryasê duyem behsa yariya xwe dike ku wê bihneke xweş bi xwe dakiribû xwişka wê ji Nêmsayê jê re şandîye, lê navê wê nabêje.... Bextiyar karîbû navê wê bigota, lê ji ber xwezaya xak û gelê xwe nikarîbû gotiba. Hem ev xaleke mixabinîyê ye ku ne alîkar bû bi derxistina zanabûn û rewşenbîrtîya nivîskar û hem jî di heman demê de xaleke bihêz bû ku tiştêkî wisa jê nefilitîye... ka kî ji kurdan bi van mijaran serê xwe diêşîne!!!

Roman ji çîstê (item) muzîkî jî ne bêpar e. Daner gewretirîn û navdar-

Di rêûresmên olî û ayînî de jî bi kar dihat û dermanê gelek nexweşîyan bû. Her wiha dara hinarê pir di kele-pûr û stranên me kurdan ên folklorî û gelêrê de behsa wê dibe. (Di rewîştî kurdî de dêm, sing û berên keçikan pê tê mînandin).

Bextyar li du cihan ev sembola bi kar anîye, yekemîn di sûndxwarina her du keçikan de ku bi xwîna xwe ev soz muhr kirin û li bin dara hinarê ya di hewşa malê de veşartin. Ev jî sembola keçkanîyê ye çî ku di romanê de wan sozek bi neşûbûnê xwarine û her keç bimînin.

A duyem di sûndxwarina her çar hevalan de ku wan jî soza xwe bi xwînê muhr kir, li vir hinar sembola gelek tiştan e.... di heyama şerê navxweyî de ew bi hev re diçûn wê cîhana cadûyî da her tiştî li paş xwe bihêlin û wê darê bi taybet dibijêrin, dara ku sembola xwîn, jîyan, biratî, hezkirin û dermanê her tiştî ye, tu dibêjî qey dixwestin bi girêdana vê yekê agirê şerê ku li wê cîhana dûr vemirînin, an jî wê koranîya ku bi çavên wan birayan hatîye, rehet bikin û ku tu peymanên aştiyê fêde li wan nakin ji bilî biratîyê, çimkî li cihekî di romanê de behsa vê xalê dibe

“Ji ber ku mirov ew dar e ku ji min re dibêje mumkin e jîyan bi awayekî din be, mumkin e em di dinyayeke ronak û saf û bêgûh de bijîn. Ev dar tişteke ku îlhamê dide me.” 236

“Niha serdema dawîya biratîyê ye. Bila ez li şûna te parçe parçe bibim û tu sax û silamet bî. Ev hemû aşî û tiştên din derew in. Divê em bi raştî

bibin birayên hev. Em vê darê dikin şahid. Em sondekê bixwin ku heta em bimirin em ê alîkarîya hev bikin, şer me ji hev cuda nakin. Sondeke ku dem û dewran bi me nedin jibîrkirin, heke na serdemek bi rê de ye bira wek kûçikan dadiberizin canê hev.” 237

Nivîskar jêhatîbûna xwe di rîstina tayên raştîyê bi tayên nîgaşê re dîyar dike, dihêle her du cîhan bi hev re bimeşin bêtî yek ji wan ji hevsengîya xwe bikeve. Wî rêbaza vegotinê di piranîya beşên romana xwe de rikandîye, li ser zimanê Muzeferê Subhdem bi zimanekî xweş û rewan, berhema xwe vegotîye. Jixwe vebêjer li vir e serwer e û yê her tiştî bi hemû hûrgulîyên wan dizane. Ew bi xwe vegotina romanê yekdeng (monologue) e ku li ser piştî qeyikê ye, ew û çend kesên din û berê xwe didin Ewropayê, ji wan re çîroka xwe vedibêje, carcaran xwîner ji atomesfera çîrokê derdixe û hinekî bi wan kesên di qeyikê de re diaxêve, tev li wilo nivîskar karîbû dîsa me vegêrîne çîrokê û wêneyan bi hêsanî li ber çavên me raxîne. Jixwe ne her kes dikare van teknîkan di çîroka xwe de bike, ji ber ku piranîya caran xwîner di hinek berhemana de neçar dibe dîsan wî parçeyê dubare bike û bixwîne. Ev jî xaleke pir giring e di hûnandina romanê de û Bextyar di vê yekê de serkeftî bû, belam ev ne wateye ku carinan şewazê vegotinê sar nedibû û ne gerekdarî kişandina xwîner bû hîn bêhtir. Wênene pir xweşik hûnane, bi giştî girêdayî derya û xwezayê ne û xwe dûrî serbarîyê xistîye, ev jî

Roman hevjiyana aram, efsane, hezkirin, nehezkirin, jîyan, mirin, tenêti, êş û azara gelê xwe anîye ziman. Cadûya wî pir bi etmosfer û rewîştê kurdan re digunce.

Roman ne dîrokî ye, lê em dikarin bibêjin ew pirtûkeke dîrokî ne fermî ye, nivîskar dîrokê di jîyana mirovan re tîne ziman û çawa dîrok zordestiyê li wan dike û wan dixê jêr konê xwe yê reş û bihnê li wan diçikîne. Roman lingê xwe li ser doşeka rêbaza jîwarîya cadûyî rame-daye û raştî û nîgaşê bi hev re dihûne, lê belê jîwareyeke cadûyî rojhilatî ye ku kirasê sofîtîyê bi ser bejna xwe de berdaye.

Ev berhem bi hûrgulîyan tijî ye ku dihêle ew berhemeke ne asayî be û xwedî hizireke payeberz be. Gelek nimînendeyên dîrokî û sîyasî dihindirîne, her wiha nimînendeyên rewîştê gelêrî ya kurdî û îslamî.

Roman komek ramanên felsefî çaksaz dike fena gera li azadî, jîyan, mirovatî û hwd...

Bextyar karîbû gelek cîhanan bi hev re bi yek nawayê govenda wan bigerîne ku di vê govendê de xwîner şîyana bûyerên piçûk û ne sereke dibîne û bê çawa dikarin tiştêkî xweş pêşkêş bikin.

Bextyar kurê jîngeha xwe ye, li gel cadûyê gelek simbol jî bi kar anîne bi awayekî yekser û ne yekser ku kesê ne di jîngeha kurdî de be û lê nejîya be jî dikare van nîşanan bibîne nola:

“Min nizanîbû ku dawîya dawîn ez û wî dê di bîyabaneke din de win-

da bibin ku ne bîyabana min, ne jî bîyabana wî bû”! 19

“Şaşwaz nebe... her tişt guherîye. Vêga desthilat di destê me de ye.”30

“Bi şevan gava ez derdiketim, li şûna sîbera bilind a çîyayan, hêla asoyên bîyabanê di çavên min de bû.” 192


Divê ev bajar fêr bibe li rûyên we binihêre.” 311”

“Dizanin ez û te bi hev ve nabin.” 334

Tev li vê jî Bextyar romana xwe bi zimanê netewperîstî ranexistîye holê û ew pîroz nekiriye. Der barê vê yekê de, wergêrê alman Stefan Wiedner dibêje: “Bextyar Elî mîna wêjeyên Rojhilata Navîn ên tundiyê pîroz û pêşwazî dikin, vê rêyê nagire û tundî û êşkişandinê nake du armancên wêjeyê yên sereke, û wan erkdar nake bo hilçûneke lezok çêbike yan jî rê ji wan re veke da ku xelk lê kom bibin.”

Sembola hinarê ku hinar bi xwe tewera romanê ye. Ji bo çi Bextyar ew bi kar anîye? Gelo çima dara hinarê ne dareke din?

Hinar li Îran, Îraq û Mezopotamya ji berî 4000 sal tê çandin û ew warên wê yên resen in û ji van deveran belavî Sûrîya, Feleştîn, Urdin, Libnan û tevahî cîhanê bû. Hinar di piranîya şarîstanîtiyên cîhanê yên kevin de û her wiha li nik hemû olên asmanî û yên din pir binirx e, bi piranî sembola jîn û jîyînê bû û her wiha sembola keçkanî, şûbûn û zêdebûnê.



wre..., her wekî navên ku bi xwezaya Kurdiştanê bi xwe re diguncin mîna, Lavlavkê û Sinewber.

Her kesayetek, qonaxêke taybet ji êş û azarê yan taybetîyekê derdibire, hebûna sê Seryasan li nik wî ne korfelaqî ye, her Seryasek kurdekî di nava xwe de hildigire.. Seryasê yekem ew e kurdê di nava zulm, zor û feqîrîyê de dijî û her wiha bi feqîrîya xwe jî binax bûye.

Seryasê duyem ew kurdê ku ji roja xwe dîtiye di şer û cengan de ye û di zindanên dijmin de dirize.

Seryasê Sêyem ew kurdê ku bi agir, top û bombeyên desthilatdaran şewitî ye û li ber bayê kîmawî tune dibe ye.

Marquez jî heman tektîk rikandîye û behsa heft nîşan kirîye li dirêjahîya deh dehsalan û dubarekirina êş, ser-

borî û her wiha dîroka reş a Amêrîkaya Latînî di dubarekirina navên kesayetan re, anîye zimên.

Di kesayeta Muzeferê Subhdem de taybetîya mirovatîyê çandîye, weku çawa di hindirê romanê de ji me re eşkere dibe, gava nema tenê li Seryasekî, belam li her sêyan digere û nema jê re giring e ka kîjan kurê wî yê resen e.

Her du keç tam taybetîyên jina kurd ji porê dirêj, zelalaîya gîyan û gewdeyê wan, deng û stranên wan, hildigirin. Ne tenê ev, lê belê hezkirina pak û paqij jî di rêya wan re nîşan daye.

Îkramê Kêw sadebûna rojhilatekî di hinavên wî de peyda kirîye û ew kirîye nimûneya herî belî di sofîtiya di hindirê romanê de, nemaze felsefeya îslamî ya hindirîn ku gewherê veyekê xwespartina mirovan li hev û alîkarîya wan ji hev re ye.

Li ser zimanê Seryasê sêyem, bi awayekî ecêb şer, atmosfera şer û dîmenên wê yên pir dijwar, rewakirina her tiştî di şer de, wêne kirîye.

Li vir dijarîya şerê biratî gava pêşmergeyên partîyekê li cem partîya din dîl dibin û hewl didin birevin, wêne dike:

“Em weke dînan diketin ser dîlan. Di jîyana xwe de hovîtiya wek wê şevê nejîyame. Em diketin dû wan û me wan bi singo û guleyan dihingavtin. Em diketin ser wan birayên piçûk û bêguneh ku me gotinek ji hev re negotibû, ewên ku bi zimanê me hawar dikirin “me nekujin”... wiha digotin û me ...” 25

dijmin e. Di zindanekê li orta bîyabanê de bîst û yek sal ji temenê xwe li wir buhirandiye. Piştî bîst û yek salî, Muzefer xwe li koşkeke pir gewre dibîne, koşka hevalê wî û serokê şoreşê Yaqûbê Sinewber e û nas dike ku wî bi xwe ew anîbû wê deverê. Muzefer destê xwe ji dinyayê şuştibû, çimkî di wê zindana bîyabanî de heta heşt bi der û demê winda kiribûn, îcar li pey xewnekê tenê diket ku kurê xwe Seryas ê ku hîn dergûş bû gava ew hat girtin, bibîne.

Lê Muzefer di gera xwe de raştî sê Seryasan tê û bi vê yekê romana me tê ristîn. Dibîne sê kesên din navê kurê wî hildane û neçar dibe li pey her sêyan bikeve. Pirsgirêka heyî ew e ku her sê kur jî heman hinara şûseyî bi wan re ye, hinara ku girêka romanê bi giştî ye.

Di gera Muzeferê Subhdem de xwîner rû bi rû xwe di dîroka salên 80 û 90yî de dibîne li Başûrê Kurdistanê ji serdema Sedam ve heta bi şerê navxweyî yê di navbera her du partiyên sereke de. Hin bi hin roman rêyeke din bi cîhana Mihemedê Dilşûşe re diajo û li wir em dikevin jêr cadûya cîhana wî ku ew bi xwe li pey raz û tiştên nenaskirî dikeve û dixwaze şîfreyên wan veke. Dilşûşe, di roja lehîyê de xwe raberî mala du keçikan dibîne û hezkirina ya piçûk dinuqute dilê wî, bo paşê em bibînin Dilşûşe li ber pêlên evîna (Lavlavka Spî) xwe nagire û bi xar wî li ber xwe dibin û dimire.

Her du keç jî xwedî cîhaneke taybet in, berîya lehîyê bi çar salan sozek

bi hev re girêdabûn da ne şû bibin, ne porên xwe kur bikin, yek bêyî ya din neştirê û tenê cilên spî li xwe bikin. Cîhana wan jî rêyeke din vedike û berê romanê diguherîne cihine din.

Seryasê yekem li bazargehê kar dikir û xwedî xweşiktirîn û piçûktirîn erebok li cîhanê ye, di nav xelkê xwe de pir bi nav û deng e, hemû bi ya wî dikan, karûbarên wan belengazên xwedî erebok bi rê ve dibe, dibe qehremanekî ecêb û wan ji kirarên tund ên asayîşan rizgar dike û bi vê yekê rêzgirtina wî di dilên wan de cih digire.

Seryasê duyem jî pêşmergeyek e, ji roja xwe dîtîye, qada şer mala wî ye û li ser xwê û nanê partîyan dijî. Muzefer di rêya kasêtan re wî nas dike û pê re diaxêve, ku ew di zindanekê de dîl bûbû piştî xelasbûna cebilxaneya wî.

Seryasê dawîn jî Muzefer wî di rêya kesayeta bi navê Stêrê Reş re li nexweşxaneyekê dibîne.

Di dawîyê de hemû cîhan digihêjin hev da ku her tişt belî bibe....

Ziman û Şêwazê Romanê:

Bextyar bi mebeşt kesekî destnîşankirî nekirîye lehengê sereke yê çîrokê da her kesayetek bi tena serê xwe lehengê qonax û dema xwe be. Em dibînin navê wan jî bi mebeşt bi kar anîye û her yek di jîngeha xwe de xwedî teybetîyekê ye fenanî, Mihemedê Dilşûşe ew bi rojhilatîyekî diltênîk û heştîyar mîrandîye. Her wiha navên kurdî-erebî bi hev re ev jî civaka rojhilatî-îslamî pênase dike... Muzeferê Subdem, Silêmanê Ge-

Xwendinek li ser Romana “Hinara Dawî ya Dinyayê”

Roman ne dîrokî ye, lê em dikarin bibêjin ew pirtûkeke dîrokî ne fermî ye, nivîskar dîrokê di jîyana mirovan re tîne ziman û çawa dîrok zordestîyê li wan dike û wan dixê jêr konê xwe yê reş û bihnê li wan diçikîne.



Zozan Birko

Hinek gotin der barê vê romanê de:

“Romana Hinara Dawî ya Dinyayê ‘bombeya’ mûsim e.” Stefan Weidner wergêrekî alman e.

“Heq e Bextyar Elî xelata Nobel ya wêjeyê werbigire, lê bextreşîya wî ew e ku kurd e. Di nav kurdan de dijminên mirovên xwedî şîyan û talênt ji dostên wî zêdetir e.” Şêrzad Hesên, çîroknivîsê kurd

Puxteya Romanê

Roman ji bîst beşan û ji gelek ke-sayetan pêk tê:

Muzeferê Subhdem, Yaqûbê Sin-

ewber, Mihemedê Dilşûşe, her sê Seryas, Lavlavka Spî, Şaderyaya Spî, Nedîmê Şahzade, Îkramê Kêw û hwd,...

Roman bi serbestberdana Muzeferê Subhdem dest pê dike. Ew dîlekî hêzên pêşmerge li cem

îslamê li Îranê xwe bi cih dike dewleta îranê, dewleta faşîst 366 jinên Kurd ên hunermend û wêjevan li gundekî kom dike û wan tecrîd û hebis dike. Reng û bedewbûna jiyanê tarî dikin, kirasê tarîtiyê bi ser bihara rengrengî de dipêçin. Tenê ji bo hunermendî û nivîskarîyê nekin. Hest, xiroş, hêvî, daxwazî û êşa bê hempa di dil de dikin zîndan, nahêlin ku hestên xwe ajo bikin, nahêlin ku giyana xwe azad bikin. Dibêjin; ev jin xirab û bê-exlaq in, divê nekevin nava civakê ji bo wê divê ji civakê dûr bikevin. Jinên herî dengxweş û zana di wî gundî de kom dikin û heya demeke ku ji hunerê û zanyariyê dûr dikevin wan li wir dihêlin. Bi pênuşa xwe ya ezez pênuşa jiyanê parçe parçe dikin. Vê dawîyê derhênerê rojhilatî Behmen Qubadî li ser vê filîmek çêkirîye bi navê Nîwemang ango nîvê hîvê. Di wî filimî de parçeyek ji jiyanê wan jinan didin ku çawa wan jinan dikin zindan. Piştî şoreşa başûr bi ser dikeve, hunermendên herî deng xweş ji rojhilatê Kurdistanê dixwazin. Zilamekî ku her tim ji jineke di zindanê de stran digot ew kal jî hat vexwandin. Vî kalî got: heya ku ew jina bi min re neyê ez naçim stranan nabêjim. Ji bo vê bi dizî diçe wî gundî, pereyan dide asayîşa li dora gund û derbasî ba jinên wêjevan dibe. Hemû jin bi kêfxweşî û dilxweşî wî kalî pêşwazî dikin. Kal bi jina dengxweş re dibêje: ez ji te daxwaz dikim ku tu bi min re werî em bi hev re stranan bêjin. Lê jina, dilhesret û zindankirî dibêje: “Na ez bi te re

naçim, heya ku em hemû jin ne azad bin, gulîyên me tev hevdû de hunandî ne, yek bisk jî dernayê ji bo vê ez bi te re naçim, gulîya min ji gulîyên hevalên min nayê qetandin.” Bi vî rengî kal bi zorê wê îknah dike, heya cihekî wê jina dengxweş bi xwe re dibe. Lê di nîvê rê de jina xwedî hesret û bi kul dizîvire gel hevalên xwe. Bi wî kalê berjewendpêrest re naçe. Dibêje: “an em hemû azad bin bi hev re deng û hes-tên xwe derînin an jî ez bi tenê ji bo te naçim.”

Jinên herî bedew û zana wenda kirin. Gelek jinên hunermend, wêjevan, dîrokzan, xwedî pênuş hatin wenda kirin. Ji bo vê di dîrokê de navê Jinan kêr derbas bûye. Û dibêjin: zanebûna jinan tune ye û jin nikare pênuşê hilde. Vaye dîrok şahide, berhem û hunera 366 jinên wêjevan dizîn, bi navê xwe weşandin û dibêjin jinên rewşenbîr, wêjevan tune ne.

Dîrok dibêje: hene û berxwedanî bi pênuşa xwe ya jiyanî kirine. Weke Eyşe Şan, Meryem Xan, Gurbetelî Ersoz, Rewşen Bedir Xan, Bêrîtan û bi hezaran jinên wekî wan tekoşîn kirin. Ji bo vê îroj dîrok dibêje; Jinên rewşenbîr hene û dê di dîka dîrokê ya nûjen de hesreta 366 jinên wêjevan derînin û binivîsin. Divê hemû jinên ku dikarin pênuşê hildin ranewestînin û giyanên 366 jinên wêjevan ji zîndana tarî rizgar bikin. Ji ber Sedsala bîst û yekan dê bibe sedsala azadiya pênuşa jinê. Bi saya pêşengtiya pênuşa jina Kurd pênuşa hemû jinên cîhanê azad dibe û dê azad bibe.

“366 Jinên Wêjevan”

Erê gelo em ji kûrahîya dîrokê dipirsin çima ewqas jinên xwedî hest, nivîs û bedewî ew ji rastîya wan dûr xistin!! Dîrok rastîyê dizane ji bo vê stuyê xwe dixê navbera çongên xwe û bersivê nade me.



Fatma Sîdo

Di kûrahîya dîrokê de her dem baskên Jina kurd şikand in, Jin bêvîn hîştin, hestên wê, pêjna wê, bedewbûna giyanê wê di tariya bireke kûr û bêdawî de veşartin. Ne tenê jinên kurd tevahî jinên cîhanê ji zîwrandina pêhesîn û eşqa wê ya bêsînor dûrxistin. Di nava rûpelên dîrokê yên stûxwar de Jinên Wêjevan û rewşenbîr her dem hewl didan gerdûn û jiyanê bi zîwrandina heşt û nivîsên xwe yên bi wate û bi êş bipêçin. Lê mixabin pênûsa xwekuj û şerker her dem li hermber pênûsa wan radiwestîya û hîna jî dixwaze raweste. Di nava pêjin û mejîyê her jinekê de bi hezaran helbest, çîrok, gotar, nivîs, roman û... hwd heye. Hevaltîya jinê bi pênûsê re gelek xurt û mîna deziyê niştergeriyê girêdayî ye. Lê pênûsa xwekujîyê û ezezîyê her dem li hember pênûsa wan dibû sînor û dixwaze bibe sînor. Erê gelo em ji

kûrahîya dîrokê dipirsin çima ewqas jinên xwedî hest, nivîs û bedewî ew ji rastîya wan dûr xistin!! Dîrok rastîyê dizane ji bo vê stuyê xwe dixê navbera çongên xwe û bersivê nade me. Ji ber ku dîrok bi nivîsên sexte tijî kirin, bê wate kirin û rengê jiyanê wenda kirin.

Ma gelo dîrok bê jin dikare bi wate û reng bibe?! De ka bila dîrok govanîya xwe ji bo 366 jinên xwedî eşq derîne û li tevahîya cîhanê bide dîtin û xwendin.

Di vê dîroka kambax de bûyerek heye ku pir balkêş e. Divê bi baldarî were xwendin û guhdarî kirin; 366 jinên Wêjevan, jinên ku mafê wan di jiyanê de hatiye wenda kirin derîne. Ji rûpelên dîroka birîndar, bedewîya 366 jinên Wêjevan ên li rojhilatê Kurdistanê, jinên ku herî zêde di Wêjeya kurdî de pêşketin çêkirine. Jinên li rojhilatê Kurdistanê ne, lê piştî şoreşa

dimilê wêjeyê de, di milê siyasî, civakî, leşkerî, aborî û... hwd. Di gelek qadan de pêşîya jinê vekir û raştîyên civakî derxiştin holê.

– Nivîsandin ji bo te çiye, çima tu dinvîsî?

Li gor min nivîs ji bo nivîsê ye, ji bo heştên xwe anîna ziman e. Ji bo êş û azara gelê xwe anîna ziman e. Nivîs ji bo raştîyan e. Ger nivîs nebe zimanê raştîyê ji raştîya civakê qut dibe, ew nivîs nabe nivîs, nabe wêje û li gor min zêde di nava civakê de nayê girtin jî. Ji ber ku civak jî li raştîyan digere, ciwan li raştîyan digerin, jin li raştîyan digerin. Ji bo wê divê nivîs bibe zimanê raştî, heşt û ramanê. Ez jî ji bo xwe bibînim û wekî jinekê bibin ayîdê xwe, karibim heştên xwe bînim ziman û xizmeta çand û zimanê xwe bikim dinvîsim.

–Çand berhemên te hene, navên wan û di derbarê çi de ne?

Min piranî gotar dinvîsandin, lê vê dawiyê min pirtûkek wergerand, a binavê berxwedana Bazên Sûra Amedê, du roman jî, yek Keça Cûdiyê Serhildêr, a din jî Agir û Çaydanê Reş e.

– Projeyên te yên wêjeyî ji bo paşerojê çi ne?

Pirtûkek di destê min de ye werdigerînim û romanek jî nivî maye, hevîdar im ku di navbera çend mehan de xilas bikim.

–Di dawiyê de peyama te ji bo wan jinên ku ji ber sedemên civakî û dab û narîtên ku civakê li ser ferz kiribû dest ji hemû xeyal û daxwzên xwe berdan , çiye û tu ji wan re çi dibêjî?

Jinê pir li ber xwe da ye, di milê jiyanî de, di milê siyasî, leşkerî û... hwd de. Ez dibêjim ku divê em jin di qada wêjeyê de jî li ber xwe bidin. Karibin bi wêjeyê jî xwe bînin ziman. Ji ber ku herî zêde bi wêjeyê em dikarin êş û azarên xwe bilêv bikin, me wekî jin pir êş kişandine, ê van êşan jî bilêv bike em in û bawerîya min jî heta dawiyê bi jinê heye ku bi awayekî pir xurt xwe bilêv bike û wêjeyê ji nû ve zindî bike.

–Rêzdar Peyman Bêrî, ji bo vê hevpeyvînê em spasya te dikin, û di kar û xebata te de serkeftinê dixwazin.

Gelek Spas, ji bo te û hemû xebatkarên kovara ŞERMOLA serkeftinê dixwazim.



Li cîhanê bûyerên gelekî xirab rû didin û sîstem bi xwe di nava kirîzekê de ye. Li hemberî van kerset û bêmafiyên mezin, pênuş bêçare dimîne. A raştî mirov dikare vê jî bêje, gelo nivîskar jî ji civakê dûr dikevin. Dema nivîskar jî ji civakê dûr bikeve, êdî wekî berê nikare raştîyan pênas bike. Ji ber ku tiştên pênuş dinvîse raştîya jiyanê ye, raştîya dil û mejîye. Ji bo raştîya civakê bilêv bikî divê bi giştî li hemberî rûdanên heyî hişyar tevbigeri û raştîyên heyî jiyan bikî. Ji bo ev bê kirin jî divê nivîskar destên xwe bixin bin kevirî û li gor raştîya heyî tevbigerin. Bi raştî wekî Cege-rxwînan bibin rewşenbîrên gelê xwe. Ji ber ku yên ku karibin vê kirîzê bidin derbaskirin, di rihê mirovan de yekbûnekê çêbikin jî rewşenbîr in.


Em ji bîr nekin, rewşenbîr pêşangên civakê ne, civak bê rewşenbîr nikare pêşîya xwe bibîne, lê rewşenbîr jî bê civak nikare bigihê armanca xwe, peyvên wî/ê wê li hewa bimîne.

-Xewn û daxwazên te yên ku tu ji bo wan kar dikî û armanca te pêkanîna wan e çine?

Tenê armancekî min heye, ew jî pêşxistina ziman û wêjeya Kurdî ye. Dema ku ez karibim ji çand û zimanê xwe re xizmetekê bikim, ev ji bo min cihê şanazîyê ye. Ji ber ku ziman çand, beden û erdnîgarî ye. Mirovê nikaribe li çanda xwe xwedî derbik-eve, nikare li xwe jî xwedî derbikeve, nikare bibe hebûn û xwedî îrade. Ji xwe dema mirov bû hebûn û aîdê xwe dikare gelek serkeftinan jî pêk bîne.

-Di civakan de bi giştî û di civaka kurd de bi taybet hejmara nivîskarên jin kême, sedem çiye, û şoreşa 19 tîrmehê di vî milî de çiqas bandor kir?

wekî tê zanîn di civakê de gelekî pêşîya jin tê girtin. Nêzikatîyekî cinsiyetparêzî heye, nêzikatîyekî bê adelet heye, ji bo wê jin di pişt perdeyê de dimîne. nego jin nizane, an hestê jinê nînin, jin gelekî hîs dike û xwedî çand û hest e. Şoreşa 19 Tîrmehê pêşîya jinê vekir, tenê ne



de diyar dibin û raştîyan vedibêje. Ji xwe jinên biraştî pir xweş dinvîsin jî hene û ez bi vê yekê gelekê kêfxweş û şad jî dibim.

– Wêjevanên jin ên girîng û xwedî bandor di wêjeya kurdî û ya cîhanî de kî ne?

Weki tê zanîn wêjeya Kurd xwe dispêre dengbêjiyê. Jinên Kurd jî di dengbêjiyê de pêşengtiyeke gelekî giring kirine. Tevî ku pêşiya jina Kurd gelekî hatiye girtin jî, lê hem di milê nivîskî hem jî di milê devokî de roleke mezin lîstine û em divê mijarê de minetdarê wan in. Kesên wekî Meryem Xan û Ayşe Şan gelekê rîsta xwe di dengbêjiyê de lîstine. Di heman demê de Mestûre Erdelanî jî, di pêşxistina wêjeya Kurdî de pêşengtiyeke giring kiriye û heta wekî dirozkana Rojhilata Navîn jî tê naskirin. Bi xwe wiha dibêje:

“Min ew jinem ke le pakî le serûy hemîwan im,

Le hemû xêlê jinan de niye kes hawşan im:

Le jêr serwênêkem de serêke hêjay tac,

Belam le zebî zeman wa qetîsî dewran im.”

- Mestûre Erdelanî-

–Tê gotin ku civak di aliyê rewşenbîriyê de kirîzekê dijî, li gor te sedem çine?

divê jin pêşengtiyê bike û xwe pêş bixe. Ji ber ku di jiyanê de jin pêşeng e, dayîkên me heta roja me ya îro çand û zimanê me dane jiyanê kirin, divê em jî li ser vê şûpê bimeşin û xwe xurt bikin.

Jin di jiyanê de xwedî erkeki serekemye, divê rîsta xwe ji bîr neke, jin dayîk e, xwîşk e, hevjin, met, xaltîk û... hwd ye. Ango jin jiyan e, divê li gor wê di wêjeyê de jî pêşengtiyê bike. Jin jiyanê hîs dike, ewladên xwe winda dike, heskeriyê xwe winda dike, bav û birayên xwe winda dike û bi xwe jî şervan e, pêşeng e. Jiyan bi xwe ye, ji bo wê jî di wê baweriyê de me ku jin dema dest avêt lînûs û pênuşa xwe kesek nikare pêşiya wê bigire. Raştîya jiyanê bi pênuşa xwe xêz dike. Lewma ev êş û azarên ku jin dibîne bi awayekî zelal di berhem û nivîsên wê



Lêkolînên min ser wêjevan û ştranbêjin jin hebûn. Dema ku min li ştran û helbestên wan gudar dikir gelekî bandor li min dikirin. Her ku min dixwend xwesteka min a xwendin û nivîsandinê zêdetir dibû. Ji ber ku dîrok û jiyan di wan helbest û ştranan de veşartî bû. Min ji deng û helbestên wan heycan digirt. Xwe di wan awaz û peyvan de didît. Ji xwe dema bi zimanê dayîkê be baştir mirov dikare xwe bine ziman û dibe ayîdê xwe. Ez dikarim bêjim ku min xwe di van helbestan de didît û nêzî raştîya xwe dibûm. Heskirineke bê dawî bi min re çêdibû. Jixwe xwendina romanên Kurdî heycaneke cuda dida min, wekî tu di raştîya dîrokê de jiyan bikî, dîrok dibû tu û tu dibû dîrok.

Carê jî êş û jan ji xweber mirov dikin nivîskar, di nava me de gelek

bûyer hatine jiyîn, bi serê xwe roman û destan in. Tinê hinekî bi hev ve girê bide, temam e. Jiyan dayîkên me dijiyan, raştîya welatê me tê de, ya em jiyandikin û hwd. Gelek tişt hene.

–Mijarên sereke di nivîs û berhemên te de çine, gelo cihê jin û siyastê di wan de heye?

Ez raştîyan dibêjim, raştîya gelê me jiyan dike, an jî tiştên ku ez hîz dikim dinvîsim. Jixwe kesê/a ku hîz neke nikare binivîse. Xwe dikim şûna wan û dibêjim, wê demê ji xwe ber mijar derdikevin pêşberî min. Ez hewil didim ku di nivîsên xwe de zimanekî sade bikar bînim û mijar jiyani bin.

nivîsên min piranî wêjiyî ne. Jixwe dema ku tu dibêjî wêje, divê êş û azara gelê xwe bîni ziman. Ji bo tu karibî wê êş û azarê bilêv bikî, divê tu wan êş û janan jiyan bikî, nas bikî.

–Li gor te, çi cudahî di navbera naveroka berhemên wêjeyî yên jinan û mêran de hey, çiqaşî bi xwezaya her yek ji wan bandor dibe?

Bêguman kesê/a dinivîse divê hîs bike. Hîs neke nekare jiyan bike, lê wekî jin dubere derketina ser dika dîrokê û wekî hebûn derketin gelekî giring e. Dema ku em dibêjin asta pêşketina jinê asta pêşketina civakê diyar dike, wê demê di wêjeyê de jî

nivîskar «Peyman Bêrî» ji «ŞRMOLA» re: herî zêde bi wêjeyê em jin dikarin êş û azarên xwe bilêv bikin



Hevpeyvîner: Desteya sernivîskariyê



Hevpeyvîna hejmarê

Bi hezkirineke mezin derbasî cîhana wêjeyê bû, tîştê ku dibîne, xeyal dike û hîs dike bi dilê jineke dayinde dinivîse.

Peyman Bêrî ya ku bi wergêr û nivîsandina roman û gotarên wêjeyî mijûl dibe û di rêya nivîsandê re heşt û ramanên xwe par ve dike. Ta niha du roman nivîsandine û pirtûkek bo zimanê Kurdî wergerandîye, her wisa di gelek kovar û rojnameyan de dinivîse.

–Rêzdar Peyman bi çend hevokan xwe ji xwîneran re pêşkêş bike.

Navê min Peyman Bêrî ye, bi nivîsandin û wergerê mijûl im, karên wergerê dikim. Di kovar û rojnemayan de carê dinvîsim.

–Kê berê te da nivîsandinê û te di vî warî de çawa xwe bipêşxist. Wêjevanên jin ên ku bandor ser kesayeta te kirin kî bûn?

Hîn di zaroktîya xwe de min ji xwendin û nivîsandinê hez dikir.

Kar û berhemdayîn hîmên avakirina kesayetîya jinê ne:

Dema ku behsa mijara karê jinê tê kirin, wêneyekî pir navdar tê bala mirov, ku ew jî karê jinê bi bermalîtiyê ve girê dide; lê li gor lêkolîneke Zanîngeha Harvardê ya DYAyê, keça ku dayîka wê jineke karker be, ew jî dibe karker. Civaka ku jin tê de karker be civakeke pêşketî ye û gihaştîye asta wekhevîyê. Jina ku pizîşk be û nexweşekî derman dike û jina ku mamosta be û zarokan fêrî xwendinê dike, derûnîya wan her dem pak e. Li berhem û berên xwe digerin û dikarin sûdekê ji hebûna xwe bigirin.

Li gelek deveran jin bi rengekî şaş tê bikaranîn û nêrîna hin civakan a li beranberî jina karker nêrîneke seqet e. Di hişmendîya gelek kesan de hizireke şaş hatîye rûniştandin ku jina karker xizan e û malbat an jî hevjinê wê alî wê nakin, ji ber ku cîyê wê mal e û payeya wê ji karê derve bilindtir e. Ev nêrîn bêhtir li ba çîna burjuwaz peyda dibe, ku karê jinê bi rewşa aborî ve tê girêdan. Lê di dîroka Misirê de, di serdema Fîrewnan a berî hezarên salan de, ev nêrîn berevajî bû; “li dirêjahîya serdema Fîrewnan, jina Misirî azadîya xwe di çûn û hatinê de bi dest xistibû, ji ber ku dema Herodot di sedsala pêncem a berî zayînê de çûye Misirê, ji jîyana azad a jina Misirî mat maye, lewre wî di pirtûka xwe ya li ser dîroka cîhanê de nivîsiye û gotiye: Jinên Misirê diçin bazaran û di bazirganîyê de kar dikin, lê mêr li malê dimînin û bi karê rîstinê mijûl dibin.”*

Xala din a hêjayî destnîşankirinê ye ew e ku gerek e jin hemû karan bike.

Wekî nimûne, li welatên Ewropayê jin dikare bibe ajokar, sazkar û polîs. Ev kar girêdayî hêza laş in. Pîranîya jinên Rojhilata Navîn van karan nakin û berê xwe didin karên din yê girêdayî xwe-makîya jinê yan jî girêdayî xwendina wê. Ev xala han dîsa me vedigerîne nêrîna şaş a der barê laşê jinê de ku ew nikare hemû karan bike. Li Tacîkîstanê, hejmareke pir mezin a mêran ji ber xizanîyê neçar dimînin ku biçin Rûsyayê û li wir di avakirina xaniyan de bixebitin. Jinên wan li gundan dimînin da ku hemû karên din bikin; ji xwedîkirina ajelan û çandinîyê heta xwedîkirina zarokan û karûbarên malê. Mêr jî salê nêzî 3 mehan vedigerin malên xwe û rewşa aborî jî geş dikin. Wekhevîyeke bedew li vî welatî dîyar dibe, ji ber ku jin azadîya xwe bi rengekî ji rengan bi dest dixe û bawerîya wê ya bi şîyana wê xurt dibe, ku ew êdî dikare bi tena xwe jîyaneke rast û dirûst ava bike.

Têkoşîna jinê ya di ber bidestxistina mafê xwe de hîn berdeyam e, lê hîn li gelek deveran ew jî serdestîya mêr azad nebûye. Ji bo ku karîbe rola xwe di avakirina jîyaneke hevbeş û azad de bigerîne -nemaze ku zagon û ol jin xistîye zindaneke teng, jin hewl dide pencereyekê veke ku têkilîyê bi cîhanê re deyne. Li vir jî xwendin û kar alavên wê yê sereke ne di warê geşkirina rola wê ya di avakirina siberojêke biserketî û afirandina nîfşekî serfiraz de.

* Keyal, Basîma, Tetewir Elmeria Ebire Eltarîx (Bipêşveçûna Jinê Li Dirêjahîya Dîrokê), Muesseset Îzedîn Litibaia Welneşîr, Beyrût, rû: 41.

Di piranîya serdemên jîyanê de, nemaze piştî ku nîvisîn û xwendin derketîye holê, her dem mêr bi xwendina xwe şerê jinê dikir û ew ji vê pêşketinê bêpar dihişt, ew jî bi behaneyê ku jin nikare bixwîne û xwendin wê dûrî erkê wê yê sereke dike, ku bermalîti û xwedîkirina zarokan e.

Di şarîstanîtîyên Yûnanên kevin de jin bê maf bû û xwendina wê jî qedexe bû, lê di nav Romayîyan de ev nêrîn cuda bû, çunku jin li wê deverê karîbû bixwîne û bi mêr re li heman cihî fêrî her tiştî bibe. Ji ber vê yekê filozofê navdar Platon xwestîye azadî bibe para jina Yûnan jî, her weha Platon gotîye ku xwendin mafê jinê ye jî da ku karîbe -wekî mêr- erkê xwe yê neteweyî bibe serî, çunku rastîya hebûnê di xwendinê de ye û mirovê nexwende nikare xwe nas bike, îcar heta demeke nêz jî xwendin li jinê dihat qedexekirin. Jixwe armanca xwendinê ne nîvisîn û xwendina asayî ye, lê gerek e jin çeka hebûna xwe jî xwendinê biafirîne. Her weha dema jin dixwîne, ne tenê sûdê digihîne xwe, lê digihîne zarokên xwe û civakê jî. Jina xwende kesayetîyeke serbixwe ye, hevjîneke pak e û dayîkeke xwedan ber û berhem e.

Di sedsala 18mîn de, li Fransa û Îngilîzîstanê axaftîneke berfireh der barê mijara mafê jinê yê xwendinê de çêbû, ku nêrîna hin nivîskarên wê demê der barê fêrkirina jinê de neyînî bûn. Behaneyê wan nivîskaran ew bû ku fêrbûna di nava malê de tenê ji bo jinê baş e û gerek e ew dûrî jîyana serxwebûnê be, ji ber ku fêrbûna di nava malê de dihêle ew guh bide pêdivîyên

endamên wê malê. Jixwe ev nêrîn pir reş û nijadpêrêst e, lê mixabin li Rojhilata Navîn, li gelek welatan, piştî zêdetirî 300 salî, ev nêrîn hîn serdest û li dar e. Ji ber ku ne tenê mêr vê nêrînê vedijîyîne, lê jin bi xwe jî vê neheqîyê dipejirîne. Wekî mînak, dayîk bi xwe vê nêrînê digihîne keçên xwe û êdî bi wan dide fêmkirin ku xwendina wan a zanîngehê jî ji bo razîkirina hevjinê wan e siberokê ye, an ku ji bo bilindkirina mercên zewac û hevjinîyê ye, ku pê re rewşa aborî ya geş dibe takemafekî zewacê.

Belkî hin kes bibêjin ku li ba mêr jî pirê caran xwendin ji bo heman sedeman e, lê li vir cudahiyeke bingehîn heye; mêr berê azadîya xwe bi dest xistiye û xwendin ji bo wî pêşketineke mirovî ye, lê rewş li ba jinê ne heman rewş e, ji ber ku dema jin dixwîne û pêş dikeve, peyameke ji xwendinê mezintir digihîne jîyanê. Xwendina jinê misogerkirina hebûna wê ya li hemberî ol, zagon û civakê ye.

Xwendin alava herî pêşketî ye ku jin di rêya wê re mafê xwe nas dike û cîhanê bi mafê xwe dide naskirin. Mary Wollstonecraft (1759- 1797), Nivîskar û danera pirtûka “A Vindication of The Rights of Women/Bergirîya Di Ber Mafên Jinê De” ya ku wekî yekemîn pirtûka di warê Feminîst philosophy de tê naskirin, dibêje: “Gerek e jin fêrkirin û çanda hizirî wergire, ji ber ku min behaneyê xwe li ser vê prensîbê ava kirîye ku heger jin di rêya fêrkirinê re ji bo hevaltîya mêr nehat amadekirin, dê pêşketina zanîn û çakîyê rawestîne û divê rastî jî ji bo hemû kesan hevpar be.”

letên Rojhilata Navîn bûn Misilman û ketin bin daraza qanûnên Misilmanîyê de. Wekî din, piranîya tevgerên siyâsî û leşkerî her dem bi rola mêr ve girêdayî bûn û tenê roleke biçûk ji jinê re hatibû veqetandin ku ev jî dîsa bûye navgîna nivîsîna dîrokeke sexte û bedewkirina rastîyeke kirêt.

Lewma, divê derfeteke din bê dayîn da ku dîrok ji nû ve were nivîsîn û lêgerîneke berfireh di nava arşîvên lêkolîneran de çêbibe. Ew serdestîya ku mêr dike mirov û jinê dike hevala wî ya jîyanê serdestîyeke seqet e, çî ku carcaran jin ne wekî mirov tê nasîn û tenê wekî jin tê binavkirin. Her weha bikaranîna xerab a jinê di warê berhemdarîya çandî de ku jin bi rengekî neyînî dibe berhema çandê, ji ber ku jin di nerîna gellek rewşenbîran de, dibe alîkara çêkirina bûjenên çandê, weke mînak ji bo helbestvanên kevnar jin xwedana siruşê bû, ku dikare bibe xwedana helbestê, û helbestkar bi alîkarîya wê helbestê binivîse, her weha ew perîka şewekar a nîgarkêşîyê ye, awaza hunermend a gotina ştraneke bedew e, heta bi reklaman jî jin bûye mijara tableta ku dikare tiştan li bazaran bide firotin, wekî mînak kompanîyên firotinê yên cîhanê dema çixare çêkîrin û xwest ew çixare bîn firotin, wan jin kir navgîna reklamê ya çixarekêşîyê û bi vî rengî çixare li dinyayê belav bûn, an ku li vir jin bi vî rengê kirêt wekî alaveke handanê hate raberkirin û bû navgîneke bideştîstina pereyan.

Wekî din, olan her dem xwestîye nêrîneke yekalî der barê jinê de belav bikin, ji ber ku piranîya dîroknasên oldar gotine ku jin berî olan bê maf bû

û zîyan lê dihat kirin. Wan her weha gotîye ku rewşa jinê piştî daketina pirtûkên esmanî yên pîroz hatîye guherîtin. Lê heger bi rastî olan alî jinê kiribe, çima jin di serdemên serdestîya qanûnên olî de nebûye serok an şah an xelîfe? Ji ber vê yekê pîrsa mezin ew e ku civak bi xwe mafê jinê binpê kirîye yan ol yan jî her du?

Bêguman rewşa jinê di hemû serdeman de ne wekî hev bû, ji destpêka jîyanê ve jinê gelek gavên mezin avêtine heta ku gihastîye vê rewşa xwe ya îroj.

Fêrbûn û Xwendin Wekî Alava Sereke ya Pêşketinê:

Di nav hemû şariştanîtiyên cîhanê de, tê zanîn ku xwendin rêya herî rast û teze ya mijûlbûn û pêşketinê ye. Bêyî fêrbûnê dê mirovê îro ne ev mirov bûya. Her weha ev jina ku wekî endameke vê civakê li hebûn û azadiya xwe digere û bi gelek qeyd û zincîran ve hatîye girêdan, dema ji nişka ve azad bibe, dê gelek şaşîtiyan bike, ji ber heger jinek bi salan di hundirê zindanekê de girtî be, û nerîna wê der barê cîhana derve ne diyar be, dema ji nişka ve ji zindana xwe rizgar bibe û ber bi cîhana nû ve bimeşe, wê di gellek koncalan de wer bibe, ji ber ti amedekirin ji bo hevdîtina cîhana nû ne kirîye, lê heger ew jin bi mejîyekî vekirî û bi alava herî pêşketî ku xwendin û zanabûn e rastî cîhana xwe ya nû were, bêguman wê ji tarîya xwe ya zindanê ku bi xwendin û fêrbûnê derbas kir, ronahîya xwe ya mayinde biafirîne, ji ber vê gereke herdem ev pîrs li holê hebe, Gelo jina ku di serdemeke pêşketî de dijî, dikare bêtî xwendin û zanebûnê azad bibe?

jin.. ji tarîya bindestîyê ber bi pencereya serxwebûnê ve



Xunav Kano

gerek e jin çeka hebûna xwe ji xwendinê bîfirîne. Her weha dema jin dixwîne, ne tenê sûdê digihîne xwe, lê digihîne zarokên xwe û civakê jî. Jina xwende kesayetîyeke serbixwe ye, hevîneke pak e û dayîkeke xwedan ber û berhem e.

Dema ku mirov çavên xwe li rûpelên dîrokê -nemaze li rola mirovan di avakirina cîhanê de- digêrîne, mirov ji rewşa serdestîya mêran a li ser hemû astên jîyanê mat dimîne, ku her dem mêr wekî serok û serkêş çûye pêş û jin jî li paş wî ye. Li vir jî ew penda gelekî navdar a dibêje; “Li paş her mêrekî gewre, jineke gewre heye” ,tê bîra me, ku ev pêngav mezintirîn bînpêkirine li hemberî kesayetîya jinê ye û faktora herî sereke ya qelskirin û vederkirina rola wê ye. Ev jî teqez dike ku divê her dem siyaseteke bindestîya di nava azadîyê de hebe û divê jin her dem hemwelatîyeke ji rêza duyem be.


Helbet ev nayê wateya ku li dirêjahîya dîroka mirovahîyê de jinên gewre tune bûn. Ev mijar bêhtir girêdayî şeweyê xwendina dîrokê ye. Ji destpê-

ka jîyanê ve çîrokek bû sedema afirandina gerdûnê ku tê de jin wekî sûcdar û tawanbara yekem hate binavkirin. Di nav vê tevilhevîya berdewam de, di civak, ol û zagonan de, jin her dem wekî parsûyê bêhêz hate binavkirin; wekî alaveke ku mêr pê şa bibe, bêhna xwe pê vede û berdewamîya tovê mirovahîyê pê misoger bike.

Li gor gelek dîroknasan, berî derketin û berbelavbûna olan, cîyê jinê girîngtir û pêşketîtir bû. Her weha wê karîbû mil bi mil li kêleka mêr bijî û bixebite. Wekî nimûne, jin di serdema Fîrewnan de xwedîmaf bû, her weha gelek caran bûye şah û rewşa wî welatî geş kirîye, lê di nav piranîya mîletên dinyayê de, azadîya jinê derewek bû û her dem laşê wê ji bo qelskirina rola wê dibû şerm, nexasim piştî ku gelek mi-



Eyşe Şan



Mastûra Erdelanî

Heman demê ku em berê xwe bidin wêjeya nivîsikî nav û heştên gelek jinan tê bala mirov dikşîne, ji wan jî Mastûra Erdelanî û Cihan Ara xanim û...hwd.

Li vir bi navkirina van wêjevanan me xwest em bêjin ku di cewherê jinê de ew heşt hatine afranandin, ku li beramberî wê qedexekirinê çiqas heşt bi şermokî derkevin holê ku jinê belkî bi rihetî jî nikarîbûye bi wê azadiya ku mêr dinivîse ew jî pê binivîse, lê dîsa muhira xwe di warê wêjeyê de hiştîye.

Bi wî tiştî xwestîye ku hêza xwe ya di wêjeyê de bide diyarkirin û ji nêrîna ku civakê li ser daye ferzkirin, ku tenê jin ji bo mal, zarok û perwerdekirina zarokan hatiye dinê, red bike û ji her kesî re bi rêya heştên xwe bibêje ez heme.

Tevî ku pir kêr ji jinan ev yek kirine û rûyê rast ê xwe dane belîkirin, ji ber ku eger ne ev zehmetîyan bûya

dê gencîneya wêjeyê xurtir û heştên wê narîntir bibûya.

Belkî ev yek bala xwendevanan dikişîne ku berhemên jinê dixwînin ango dibihîzin dikevin wê ferqê, ku hemî bi janê û zehmetiyê hatinê nivîsandin, her jinek di her berhemekê de êşa xwe û ya jina dinê tîne ziman, lê ev yek di berhemên mêran de tune ye.

Em ji bîr nekin jî ku jinê bi heştên xwe, xwe gihandiye asta xwedawendiyê û mîna xwedawenda xweşikî, dilovanî, aşîti û... hwd hatiya naskirin.

Di roja me ya îronî de jî em dibînin ku kêr zêde hejmara nivîskar, wêjevan û heştêkarên jin pirtir bûye, ew jî dihêle radeya wêjeyê di her zimanî û di nava her civakê de bilindtir bibe.

Ji ber ku wêjeya ku heştên jinê tê de tune be ew wêjeyê xav û bêçêj e.

Jin û wêje



Cîhan Hesên

Di roja me ya îronî de jî em dibînî ku
kêm zêde hejmara nivîskar, wêjevan
û hestkarên jin pirtir bûye, ew jî
dihêle radeya wêjeyê di her zimanî û
di nava her civakê de bilindtir bibe.

Dosyaya hejmarê

Dema ku mirov behsa wêjeyê bike, helbet divê rola jinê jî tê de bîne ziman. Bi tayîbetî gava ku mirov bixwaze serî li wêjeya Kurdî bide, tevî ku Kurd jî weke millet di welatê xwe de dijmin dixwest wan dûrî ziman û kultura wan bixe, komkujî, birandin û bindestkirin li ser wan dida meşandin, lê dîsa jî li ber xwe dan û nehiştin ku ziman û wêjeya wan winda bibe. Li vir jî jina Kurd têra xwe ji van êşan para xwe girtiye, lê dîsa jana wê girantir bû ji ber ku her dem di nava civak, malbat, welat de şerê koletiyê bi her awayî li ser dihate meşandin.

Ev azaran hemî jî rê li ber heştên wê yên wêjeyî negirt ji ber ku bi xweza, derdor, xweşîkbûn û heştên xwe yên li hevhatî yek bûn.

Ji bo wê ku mirov berhemên mêran dixwîne, dibîne ku tiştên wan berheman temam û xweşik dike bi karanîna be-

dewiya jinê ye ku em dinêrin lehenga sereke ya wan berheman jin e.

Ew yek dihêle ku xwendevan ji wan heştan zêdetir hez bike û daxwaza xwedî li ser zêde bibe. Yanî em dixwazin bibêjin li her derê û di her nivîsê de jin weke hêzeke ji bo têrkirina çelengiyê û zaniştê hatiye xuyakirin.

Her wiha ku em behsa berhemên jinê bi xwe bikin jî ku wê heşt diguviştin ser hev ji tirs û nêrîna derdorê, dîsa di hundirê jinê mîna avekê dikelîya û buxara xwe ew hezkirin aşkere dikir û bi xwe re dikir berhem.

Ji bo wê di destpêka avabûna gerdûnê de û bi xwe re derxistina wêjeyê mîna wêjeya devokî jin xwedî roleke taybet bû di heştên xwe de.

Mînaka wê jina Kurd Eyşe Şan bû, ku civakê çiqas xwest heştên wê bi-kuje, lê wê nikarî bû ew kela heştîyar vemirîne û xwe gihand roja îro.

Wêjeya şoreşê û artêşbûna jinê li çîyayên Kurdistanê, em dikarin ji rojnivîskên jinên şoreşger ên ji sohbetên hevalên xwe yên dora agirê daran ketine rê û çavek li dîroka nêzik gerandine bixwînin. Di sê bergên berhema şoreşger û konevana kurd Sakîne Cansiz bi nasnav Sara yê de jî jiyan civakî û zorîyên jinek şoreşger a bûye derwêşek hemdem û derketîye gera xwebûnê derketîye pêş. Naveroka berhemê di navê wê yê “Jiyana min her dem şer bû” de baş xwe dide teyisandin. Ji pêvajoya zarok û xwendekarîyê heya dezgahên îşkenceyên Zindana Amedê weke xelekên zincîrê hev şopandîye heya gihaye wargehên azad ku bi vegotina wê “Çavkanîya jiyana min.”

Li ser bergê berhema pêşenga çapemenîya azad Gurbet Eliersoz jî hevoka “Min dilê xwe bi xweşîkbûna çîyan nexîşandîye” naveroka wê ya ji rojên rojnameya Ozgur Gundemê heya gêrilatîya çîyayên Kurdistanê tîne ziman. Di rojnivîskên weke Xeyalên Sarayê û rojnivîska Bêrîtanê de jî zorîyên zarokên kurd ji dayikbûnê di navê de mezinbûne, mêtîngerîya ser welat û li hemberî wê gera ciwanan a azadîyê baş nîşan dane.

Ji nava dîwarên zindanan wêjevan û şoreşgerên weke Mizgîn Ronak û Rojbîn Perîşan raştîya civaka bindest û êrîşên pergala deshilat ên bêsînor bi çîrok, roman û helbestan vegotine. Mizgînê di romana binavê “Nobedarê Gulên Kobanê” de ji çavê dînekê şerê werçerxanê yê herî giran aniye ziman. Dîwarên zordaran nikarin pêşîya gera

wan a xeyalên azadîyê bigirin. Ji lewra ew bi hêza romanê derdikevin derê, ji tilîlîyên li Kobanê tarîya şevê qelişandine heya zarokên li Helebce û Şarezûrê bibêhina sêvan nefesa dawî dane komkirine û nivîsandine.

Nivîskar û rojnamegera ku alîyê ferehîya jiyanê ji xwe re kirîye mijar û li hember her bûyerên neyînî ji kenê xwe tawîz nedaye Evrîm Alataş jî heya nefesa dawî nivîsî û nivîsî... Ew ê hem nûçeya belavkarên rojnamê ku bi navê Generalên Apê Mûsa dihatin navkirin dişopand û hem jî jiyan wan û bûyerên di nûçeyên wan de derdiketin pêş bi şeweyê çîrokî danehevên wan kire pirtûk. Çinar Said, Kejal Ehmed û Roza Metîna bi berhemên çîrok, helbest û roman derketine dika wêjeyê û ji alîyê xwendinhezan ve tîne şopandin.

Dema em bala xwe didinê dibînin ku li peyî hemû wêjevanên navdar ên weke Yaşar Kemal û Mûsa Anter jî teqes keda jinan tê dîtin. Tîlda Kemal berhemên wêjeyî yên hevjinê xwe Yaşar Kemal wergerî zimanên bîyanî kirîye û bi cîhana derve daye nasîn. Rojnameger û nivîskar Mûsa Anter ê bi nasnavê Apê Mûsa tê zanîn hîna biçûk bavê wî jiyan xwe ji dest dide. Dayika wî Fesla Anter a keyaya gundbûye ew mezin kirîye û bandor li tevahî jiyan wî kirîye. Ew serîrakirina wî ya bêtirs heya nefesa xwe ya dawî li hemberî bêmafiyan sekinîye ji helwesta dayika wî ya ji xwe bawer û serhildêr tê. Dema mirov li van mînakên jorê jî dinêre hîn zêdetir raştîya gotina “Li peyî her mîrekî jêhatî jineke çeleng heye” radixe berçavan.

heye. Ji ber mirov nikare li ber ronîya elektirîkê û ekranê tv yan çîrok û ser-pêhatîyan guhdarî bike. Ji bo wê jî pê-divî bi dîwana dora agirê daran û li ser kozên kêlekê jî dengê kela çaydanê reş heye, heya mirov bikaribe bi çîrokê re derkeve gerê û bi gotina çîroka me çû destê dayik û bavê me çûn buhiştê vegere ber kozan.

Li welatê bedewîyê hemû heyîn malê xenîmetê hatine dîtin û di bawerîyan de jî ji bo talanê helal kirine. Parêzvanên erdnîgarîya Mezrabotanê timî jî bo paraştina xezîneya bîra xwe ya dîrokî li rêbazên cuda gerîyane. Gotin kirine çîrok û ser-pêhatî, beyit û destanên dîrokê bi zimanê herî sade vegotine û di hişê zarokên xwe de bicih kirine. Herî zêde jî dengêbjîyê di vê rêbaza paraştinê de rol girtîye û di nava pencên qirkirinê de xweserîya xwe paraştîye.

Sîmgeyên dîrokî jî li ser çermên laşê xwe bi deqan neqîşandine û ji zarokên xwe re nîşan dane kîjan ji bo çi bikar anîne. Ber ser derîyên malan ve sîmgeya bereketê gîyayê hermel bicih kirine. Li cihê runîştinê jî perdeyên spî yên bi nexşan li ser şemaran, teyrê tawis û şahîn neqîşandî bi dîwaran ve daleqandine. Di her dîtin û mêzekirinê de ew wêne di bîra mirovan de bicih dibe û bi dirêjahîya demê re ji ber çavê mirovan naçe. Yê mane jî li ser çermê laşê xwe bi deqan nexîşandine û heya gorîstanê bi xwe re birine.

Beyîtên dîrokî bi awayê destan û ştranan domandine. Ji radîyoya Êrîvanê ya li penaberîyê heya radyoya Bexdayê Fatma Îsa, Zadîna Şakir, Ayşe Şan,

Nesrîn Şêrwan, Meryem Xan û keçma-ma xwe Elmas Xan ê bîra wêjeya kurdî xistîne bin qeyîdan û jîndar kirine. Van kesayetên xwe derbaskirine, malbata xwe hêlane û bi heqîqeta civakî re bûne yek. Ji ber wê jî dema di nava tercîha mal û dengêbjîyê de mane, dengêbjî bi-jartine û li pey bîra kurdîya di hunera devkî de xwe dide teyîsîn çûne.

Jiyana rojane bi hemû başî û nebaşîyên wê ve di nava gotinên ştranên xwe de bicih kirine. Bi kilama “dêre sorê biçûkê” û “Xalê Cemîl tu extîyarê dîno ez gedeme” zewaca di temenê biçûk de ku hîna jî pîrsgirêkek sereke a civakê ye anîne ziman. “De daye” jî hejarî û feqîrîya hîna weke qeyrana aborîyê çareserî jê re nehatîye dîtin pênase kirine. Strana qederê jî çavkorî bawerîya heya niha jî bê ku bi-pirsîn û li derdora xwe binêrin ji efendîyê xwe bawerkirinê vedibêje...

Her çendî weke berê di qada wêje û dengêbjîyê de cih ji jinan re nehatibe dayîn jî ji awayê gotinê diyare pîranîya ştranên dengêbjîyê jinan hûnandine, li hev anîne û despêkê gotine. Weke strana lawîkê metînî û Şahîno, Di destanan de jî piştî Memo xwe kuştina Zînê, piştî Siyabend xwe ji Sîpanê Xelatê avêtina Xecê û piştî Derwêş biçolan ketina Edulê wefadarîya jinan û girêdana wan a bi soza wan re ne. Strana Xecê li ser Sîpanê Xelatê raserî Gola Wanê sekinîye û gotîye, Lorînên Binefşa Narîn li ber darê dergûşa Cembelîyê biçuk û hewara Edulê ya “Derwêşo Lawo...”hemû rewşa civakî û cudahîyên di navbera mîran, began û civakê de tînin ziman.

dewlemendî û bedewîya xwe ya nimûneyî ji bo jinên wêjevan bûye çavkanîya sirûşê. Ji Cizîra serxetê heta cihê şunwarên despêka mirovahîyê Nînova û Musilê jinan bi helbestên xwe raştîya jiyanên demdirêj li van herêman vegotine. Siriye Diyarberkirî ku weke helbestvana Amedê derbazî qeyîdên dîrokê bûye, di navbera salên 1230-1283'an de jiyaye. Di sedsala neh-an de du xwişkên hev Eyşe Cizîrî û Fatma Cizîrî du alimên dibistana kurdî ya Cizîra Botanê bûne û berhemên wan ên wêjeyî hene. Di sedsala duyemîn de jinek zanişt Sîtî Lobabê Kurdî keça yek ji paşayên serdema xwe yê Musilê ye. Her çendî weke wêjevanên dinê berhemên Sîtî jî nemabin, tenê mayîna navê wê nîşan dide ku berhemên wê yên wêjeyî yên ku negihane dema me hebûne. Li kêleka çemê Dicle jî sînore parçekirina Bakur û Rojavayê Kurdistanê heye. Di kilamên kurdîyên weke hêjîra çiyayî de gotinên weke “cizîr binxetê wo lê lê lê lê...” cih girtine. Em ji van kilamên devkî dizanin ku timî kurdan sînoren parkirina welatê xwe weke xet binav kirine. Jiyana alîyê dinê yê xetê xeyal kirine û bi jiyana xwe ya rojane ve girêdane.

Weke ştrana mîrkut bînin vî alî gelek ştranên ser amadekirina dexil û danan hene. Li ber conî û goroseyan jinan hem karê xwe bi palehî kirine hem jî di ber re ştran gotine. Di ber karên komî re teqez ştranbêj hene, ew despêdikin û yên dinê jî lê vedigerînin. Her ku kar dirêj dibe ştran jî pêre dirêj dibe, ji bo wê westandin jî çênabe. Di koçerîyê de jî ştranên weke heyî bêrî

bêrî ser bêrîvanîyê jî pir hatine gotin. Di kilaman de bêrîvanên ji rêza bêriyan dereng mayîn û bi zorê xwe gihandine derbêrê, bêrîyên meşka wan a şîr mezin û giranîyê ser meşa wan çêdikin hemû diyar in.

Cardin ştranên ser paraştinê hene. Dêhilatan timî êrîşên xwe bi navên cuda li ser herêmên jiyana xwecihî domandine û êrîş birine ser niştecihên herêmê yên bi sîstema qebile û eşran paraştina xwe kirine. Di pêvajoyên paraştinê de jinên weke Qedem Xêr, Hatu Şahnaz, Deyfe Xatun, Zarîfe û Besê di eniyên pêş de cih girtine û paraştina erdnîgarîya xwe kirine. Em bi berhemên wêjeyî û ştranên dengbêjîyê digihin raştîya cesareta van jinan di çeperên pêş de nîşan dane. Dîroknas û wêjevanên weke Meştûre ya Kurdistanî wan pêvajoyan bi lêkolînên dîrokî û vehûnandina helbestî bibelge kirine.

Ew dizanin dizên dîrokê hene ji ber wê jî timî ziman û çanda xwe di berhemê wêjeya devkî de veşartine. Herî zêde bîra xwe ya dîrokî ji bo zindî bihêlin û veguhêzin pêşerojê dengbêjî ji xwe re bingeh girtine. Di tarîya şevan de li dora agirê daran weke rêza govendê ronîştine, li ber çaya germ û bitam a ji çaydanê reş dengbêjî guhdarî kirine. Ew dengbêjîya bi dîwanî di hişê hemû mirovên guhdarî kirine de mayînde bûye. Şêwaza guhdarkirina dengbêjîyê jî wihaye. Despêkê hewceye cih li gor dengbêjîyê xwezayî û sohbet germ be, paşê jî dîwana derdorê pêre bibe yek û heya nava kûrahîya dîrokê biçin.

Çîrok û serpêhatî jî bi heman şeweyî pêdivî bi ketina hewayê wê

Jina wêjevan



Zehra Tunc

Her çendî weke berê di qada wêje û dengêjîyê de cih ji jinan re nehatibe dayîn jî ji awayê gotinê diyare piranîya stranên dengbêjîyê jinan hûnandine, li hev anîne û despêkê gotine.

Dosyaya hejmarê

Wêje bi narînî vegotina bûyeran, bi hemû hûrgiliyên der û dorê re ye. Berhemên wêjeyî xwendekar û guhdaran bi xwe re heya cihê berê diyar kirîye dibe û careke dinê vedigerîne kêliya têdeyî. Hêza lêhurbûnê û qabiliyeta vegotina jinê hîn zêdetir wê nêzî wêjeyê kirîye. Ji xwe wêje hinek çavdêriyên jiyanî û hinek jî pênasekirina wane. Jin bi buyeran re vedigerin bîra binhişîya çanda civakî ya xwedîyê kokên dîrokî yên qayîme û bi dema têdeyî re girê dide, paşê li ser dirame û encamên baş jê derdixe.

Ger em çavekî li wêjeya qedîm a bi dengbêjî û vegotinê ku weke wêjeya devkî tê pênase kirin bigerin, em ê rastî gelek jinên ji ber keda xwe ya civakî û wêjeyî bernavê dayê girtin û weke dayika giştî hatî binavkirin bîn. Jinên li ser xet û binxeta navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê bi berhemên

xwe yên wêjeyî xwedî şato bûne, nasnavê dayê girtine, weke Dayê Xezana Serkeftî û Dayê Tewrêza Hewramî gelek helbestvanên tenê navê wan mane hene. Ji ber bandora dayê yên wêjevan hîna jî ser jiyana herêmê serwere, ji ber wê jî devera şideta ser jinan qet neyî Hewreman e...

Di qadên din ên jiyanê de jî jinên cihê xwe di kûrahîya bîra welatîyan de girtine û nasnavê dayê ji bo wan hatine wesifandin hene. Ji pêşengên Komara Mihabadê Mîna Qazî jî bi heskirina xwe ya welatîyên herêmê û axa Mihabadê re nasnavê dayê girtiye û weke Dayika Mihabadê hatiye pênase kirin. Mama Nergîza Şarezûrî jî weke dayika herêma Şarezûrê di nava berhemên wêjeyî yên yarsanîyan de cih girtiye. Ew berhem bi dengê sazê re li dergahan û malên cemê hatine gotin.

Ber peravên Çemê Dicleyê bi

ku dide nîşandan, li wir giringîya xwe di malbatê û civakê de didan çêkirin, ew jin dibe wêjevanêke xwedî cihekî pir xurt.

Îro em di şoreşekê de ne, îro em di berxwedanîyekê de ne, îro em helwêstêkê li hemberî destlâtardariyê nîşan didin, hem li hember hişmendîya destlâtardariya mîr û hem jî li hemberî dagirkeran, ew rengê azadiyê dixwazin.

Em vê jî dikarin bidin îfadekirin, a herî rast ku tê xwestin ji jinan, rewşenbîr û wêjevan ku bikaribe xweşîkbûna jinan bi rengekî wêjeyî derxîne holê. Van gotinên xwe bi rengekî wêjeyî red bike, wê demê ew jin dikare bibêje ez nûnertîya wêjeyê dikim, an jî ez jineke di wêjeyê de cihê xwe digirim, dikarin pêşengîya civaka xwe bikim.

Helbet jinin hene ne eşkere ne, an jî pir pîtedaniyê nadin, lê xwedî karînin. Em bikaribin xwe bighînin van jinan.

Jin di welatê me de, îro ji her demê bêhtir dikare rola xwe bilîze, derfeteke mezin li pêşîya wê vekirî ye, tiştekî asteng li pêşîya wê tune ye, a girîng ew e; jin karibe heştên xwe û dilê xwe bike yek ji bo xweşîkbûna ruh derxe ortê, di welatê me de kêmbûna wê heye? Helbet heye, em dibînin jînên dixebitin di vî beşî de jî lawazîya wan heye. Pirsgerêk çî ne? Ya girîng destpêkirin e, her çî qas lawaz be jî, wê serkeftinên baş bi xwe re bîne. Ez dibêjim ji bo hevalên bi taybet di wêjeyê de cih digirin, ji me hemuyan tê xwestin em bikaribin

hişmendîya xwe, hizrê xwe, pênuşa xwe, zanîsta xwe bixin bin xizmeta civaka xwe de, ji bo ku em karibin hemû civaka xwe di vî milî de rizgar bikin û bikaribin xwe bighînin rastîya wê ango; dîroka jin a ku nehatîye nivîsandin û ya ku li benda nivîsandinê ye, rengê azadiyê îro em di vê şoreşa xwe de pir xweşîk dikarin bidin îfadekirin, heger em vê nekin tê wateya ku hêza me tune ye, û me tiştek jî wêje û dîrokê fêm nekirîye.

Dema me pêkanî û me nivîsand hîngê em dikarin bêjin me mafên qehremanan îfade kir, wê demê me mafê wan da, çimkî ev qehremantîyek e, ê ku qehremantîya wan dide îfadekirin û nivîsandin wê em bin.

Ez di wê hêvî û bawerîyê de me hemû jin bikaribin di vê hêlê de roleke girîng bilîzin, hîn zêdetir girêdayî bin bi milê wêjeyê re, hîn zêdetir hizr û lêhûrbûna xwe kûrtir bike, bikaribe bibe jineke ku di rastîyê de di asta helwestan de be, di hizir de guheritn û pêşketinan çêbike, gîyanê wêjeyê pêş bixe, civakeke wêjeyî derxe holê û nîfşên paşerojê jî li ser vî ruhî bide avakirin, çimkî heger em vê rolê bilîzin em ê netenê ji roja îro re binivîsin, em ê ji bo sed salan binivîsin ku piştî sed salî din, hezar salên din mirov li rastîya me, meyze bike. Me wê demê karî çî bikin? Ji bo wê hemû hevalên jin di vî milî de bikaribin rola xwe di wêjeyê de bilîzin. Em di bawerî û hêvîyê de ne ku her diçe ev jina ku di wêjeyê de rol dilîze zêde dibe, pêş dikeve û hîn zêdetir jî wê bikaribe vê rolê bigire ser milê xwe.

hat fetisandin, lê îro na, îro heger bi temamî nikaribin xwe rizgar bikin jî, di gelek milan de da jîyankirin, lewre, îro çi ji jinê tê xwestin? Ji her demê zêdetir ev jin bikaribe vê guhertinê bide çêkirin, dema ku em vê raştîyê ji bo jinê dibêjin raştîya vê civakê jî dibêjin, ango civaka bindest civaka Kurd dibe, suryanî dibe, zimanê destlatdaran nehiştin zimanê xwe bi hestên xwe kar bikin, xwe îfade bikin heta bi awayekî em dibêjin milletê bindest di milê wêjeyê de nikaribû xwe pêş bixin.

Rewşenbîrên ku wêjeyê dinivîsin di şoreşên xwe de pir roleke giring dilîzin, ji bo mirovan raştîya şoreşê bide fêmkirin, ji bo ku tu bikaribî ji wî mirovî re bibêjî, ji derdora wê civakê re bibêjî va ye raştî ev e, raştîya vê jinê ev e, raştîya vî ciwanî ev e, raştîya vî şoreşgerî ev e, raştîya vî mirovê yextîyar ev e, mînakên wisa di welatê me de pir in.

Li gor min niha em dikarin bi hezarên pirtûkan li ser Efrînê çêbikin, bi hezarên helbestan binivîsin, xîtabên ku li ser raştîya Efrînê îfade dikin û heşt salan di şoreşê de em dikarin destaneyên lehenga ku hatîye kirin, bi hezaran em dikarin binivîsin.

Çi pêwîst e? Xwewestan divê, xweîfadekirin divê, qeyd û bendên îfadekirinê li ser me rabûne êdî em serbest in di hişmendîya xwe de, êdî em dikarin rehet bihizirin, ji bo wê yekê heger em hizirandina xwe û hestên xwe bikin yek, wê demê em dikarin roleke girîng bilîzin. Rewşenbîr bixwe jî pêşbazî ye, rewşenbîr

pêşengtîyê dike, wêje pêşengtîyê dike û jinek ku dema raştîyê dibîne dixwaze guhertinê çêke, ango pêşengtîya vî tiştî bike.

Dema ku pêşbazî di wê demê de dixwaze nameyekê bide jîyanê ê ku şaş hatîye çêkirin dixwaze nameyekê bide şandin berê çi bû? îro çi ye û wê sibe çi be?

Pêşengên civakan wêjevan bixwe ne, dema te got jin dikare vê rolê di wêjeyê de bilîze, ji bo wê yekê dema em li stranekê guhdarê dikin, dema li helbestekê guhdarî dikin, dema em romanekê dixwînin, paşerojê de, divê çi guhertinê bibe? Mirov pir pê bibandor dibe. Bi hezarên pirtûkên xelkê em dixwînin raştîya civaka xwe xweş îfade kirine, tu dibêjî gelo ev berê hatîye jîyankirin, îro çawa ew civak jîyanê dikin? lewre ez dibêjim jin dikarin vê bikin; lêkolînekê der barê civaka xwezayî de bikin, romana civaka xwezayî çêbikin, rengê wê wêjeyê derxînin pêş, rengê wê helbestê derxînin pêş.

Di van pênc hezar salên bindestî û desthilatdarîyê de jîyanek zor û zehmet hatîye jîyankirin, bi hezaran roman dikare jê derbikeve li ser jîyana ku dapîrên me jîyankirî û li ser kevneşopîyên civaka me hatîye jîyankirin.

Jinek di malbatekê de çawa dikare jîyan bike, gelek mirovan raştîya xwe nivîsandin, jinî hene li ber xwe dane ji bo ku xwe bide îfadekirin, mînak dema ku dibêje gelek di malbêtên me de tîne jîyankirin, ev tê çi wateyê? Helbet li wir bi xîtabeta xwe, bi helwestên

kes hene xîtaba wan xurt e, bi gotinê dikarin bibandoreke mezin li civakê bikin, û rengê jîyana civakê biguherin, nerînên xwe bikin pirtûk, tu jî nerînên xwe di xîtaba xwe de dikarî bidî îfadekirin, dêmek axaftin xîtaba mirov xurt dike, dema bi heşt, dil û mejîyê xwe baxive. Mirov wî heştî dikare îfade bike, wê demê dikare wateya durîst a raştîya ku dixwaze bide îfadekirin ji civaka xwe re bibêje. Gava em li dîrokê temaşe dikin, bi hezaran mînakên wisa hene. Ji bo wê em dibêjin wêje ew e: Ku mirov bi rêya wê dikare heşt û ramanên xwe derbirîn bike hem bi nivîskî, helbestî hem jî bi xîtaba xwe û gotinên xweş bîne ziman, li vir du rengên wêjeyê derdikevin pêş, yek berhemekî fikrî bike pirtûk an jî berhema fikrî bi gotinên bedew ku bikaribe bandorê li mirovên derdora xwe bike, ji bo wê ez dibêjim îro ji bo ku jin tiştêkî li jinê bandor bike tune ye, jin gelek derfetên jîyanê jê re vebûn, ku ew jin bikaribe wêjeyê bide çêkirin, lewma dema niha em li welatê xwe meyze dikin, hejmara jinên ku wek rewşenbîr derdikevin pêş pir hejmareke kême, li gor nerîna min jin xwe berpirsyar nabîne, ji vê yekê jimar kême e, her jinek ku li Neolotîkê meyze bike, rast e wê demê nivîs nebû jî, lê bi hunera xwe ya çêkirinê û meşandinê dikarî weke wêjevanê pir xurt derkeve ku bandorê li mirovan bike û wan li xwe kom bike, di rengê wê jîyanê de pêşketin çêkirin.

Jin vî heştî jîyan dike îro jî jin dikare vê rolê bide meşandin, hemû jin, a

ku dikare xwe bi nivîskî îfade bike, an dikare bike roman an helbestekê yan jî bi gotinên xweş û xîtabeke xurt karibe bandorê li derdora xwe bike, çimkî em îro dibînin pir kême jin derdikevin dinivîsin pir kême jin xîtabê dikin, jina bikaribe bi raştî li civakê bibandor bike û bikaribe helwesta van hevalên ku îro di beşên rewşenbîrîyê de cihê xwe digirin, taybet jî di milê wêjeyê de, li gor nerîna min êdî gerek dil û mejîyê xwe ji destlatdarîya ku heyî rizgar bikin.

Ew derfet heye ku em rizgar bikin? Helbet heye, ji ber ku em dibînin fikrê R.Apo yê ku dihêle ku jin ji hemû qeyd û bendên hene xwe rizgar bike.

Jina ku di nav çar dîwaran de bû, îro ji nav wan dîwaran derketîye, em dibînin ew jina ku nêzî sîyasetê nedibû, îro di sîyasetê de rola xwe dilîze, her weha ew jina ku tevlî hêzên leşkerî nedibû digot ev ne karê min e, îro ew jin di şer de, weke fermanîdar pêşengtîyê dike, ew jina ku digot nikare rêveberîyê bike û karê rêveberîyê yê zilam e, îro di rêveberîyê de roleke giring dilîze. Nerînên ku digotin jin ji sîyasetê fêr nake, îro jin di sîyasetê de pêşengtîyê dike, ango ew dema ku dibêjin nikare bibe wêjevan an jî nikare xwe bîne ziman, ew dem derbas bû.

Berê me wisa digot, jin nikare xwe îfade bike, jin çima nikare xwe îfade bike? ji ber ku dil û mejîyê wê hatine guhertin. Destlatdarîyek li ser dil û mejîyê wê hebû, hemû jîyana wê qeyd dikir, di bin çanda jinê, di bin kevneşopîyên destlatdarîyê de di-

pişt re? Çima nekarî reng û şeweyê jîyana xwe bi awayekî baş derxîne holê? li gor min piştî destlatdarîya mêran, zihnîyeta zilam a hakim dibe destwerdanê li ser mejî û dilê jinê çêdike, mirovekî ku mejî û dilê wî ne yên wî bin, yan jî desthilatdarî li ser be, di qefesekê de be, ew ê nikaribe wêjeyê pêş bixe, ji bo wê em ê li pênc hezar sal meyze bikin, gelek rengê jinê derketine ku xwestin pêşengtîya dîrokê bikin, lê asta destlatdarîyê ev qebûl nekir, her dem destwerdan li ser zêde kir, ji bo ev derfet ji jinê re venebe û Raştîya xwe ya biêş îfade neke. Her çi qas di van demên dawî de hinek jin derketin, xwestin raştîya jinê bi hinek pirtûk û romanên îfade bikin, an jî îro jin derdikeve romana xwe bi destê xwe dinivîse, romana xwe bi helwesta xwe dinivîse, dema ku jin ne bi mejîyê xwe binivîse yan jî teqlîd bike ew ti sûde nade, em dibêjin pêşxistina jinê di wêjeyê de ango; rola wê ya pêşeng di wêjeyê de, lewma gereke jin bi mejîyê xwe û hişmendîya xwe bi kar bîne di wêjeya xwe de, ji bo wê gereke pêşengtîyê bike û bêje: ez ê çawa rizgar bibim, ez ê çawa jîyan bikim, ez ê çi bikim?. Li gor min jin divê van romanên binivîse. Gotineke R.APO heye dibêje: "Dîroka jinê ya koletîyê nehatîye nivîsandin, dîroka wê ya azadîyê li benda nivîsandinê ye" di vê derbarê de em dikarin çi bikin, madem dîroka azadîyê li benda nivîsandinê ye? Jina ku îro pêşengtîyê dike di hemû helwestên xwe de, jina ku îro temaşe dike dikare wan heştan binivîse, qehremantîya ku îro tê meşandin, binivîse.

Helwesta jinê li hember desthilatdarî û dagirkerîyê binivîse. Li gor dîtina min di dîrokê de wêje di zilam de hatîye sînardarkirin. Vê hiştîye ku rengê wêjeyê were şaşkirin yan jî em bêjin kêmkirin, çimkî dema ku em vedigerin rengê jinê û xweşikbûna jinê di jîyanê de rewşekê dide avakirin.

Wêje divê bi hestekî rehet û nazik bê nivîsandin, lê ji vê zêdetir ji wêjeyê re amade be ji bo binivîse bi hestekî xweş lê pêşî divê jin be, çimkî wêje jîyanê xweşik dike hem di milê fikr de hem di milê ruh de, helbet dema em vê wêjeyê binivîsin bi rengê jinê raştîya heyî jî gerek em îfade bikin, raştîya jîyankirinê jî gerek em bidin nasîn, lê em ê çawa bikaribin guhertinan bidin çêkirin bi rengê jîyana xwe, çimkî mînakên jinên pêşengtîya vê kirina pir in.

Ev wekî kelem in di pêşîya jinê de, lê îro şoreşa ku em tê de dijîn bi taybet li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ango; Rojavayê Kurdistânê jinê dikarî van keleman ji holê rake, helbet ev tiştê ku em dibêjin netenê li ser jina Kurd bandor kirîye, lê li ser tevahî jinên cîhanê bandor kirîye, jina ku derkeve bi raştî bikaribe piskolojîya jinê îfade bike, jinek derkeve riyalîteya ku îro jin tê de dijî îfade bike, jinek ku bêje ev jin wê çawa rizgar bibe, îfade bike, jinek derkeve ku bibêje em ê çawa bijîn, binivîse, jinek derkeve bêje rengê jîyana azad çi ye? û binivîse. Wê demê ji nû ve paşerojê datîne pêşîya xwe.

Roman ne tenê wêje ye, em dibêjin du rengê wêjeyê derdikevin pêşberî me, yek nivîsandin e, didu jî gelek

Rola jinê di wêjeyê de

Ger naveroka nû dil e, şêweyê kevin zimanê vebêjê ye. Ger mirov herduyan neke yek, yekgirtin nabe. Ger em bikaribin vebêjê bi naveroka nû re bikin yek, ez bawer im dê ev bibe ronesanseke wêjeyê jî.



Zelal Ceger

Dema ku em li ser jin û wêjeyê daxivin, an jî rola jinê di wêjeyê de, helbet çend pirs tên bîra me, em bêjin jin çima rola xwe di wêjeyê de nelîst? Kelemên ku derdiketin pêşîya jinê çi ne? Çi bûn, û îro jî jinê çi tê xwestin ji bo ku bikaribe vana keleman derbas bike?

Helbet dema ku em bersiva van pirsan bibînin wê demê em dikarin rastîya ku jin rola xwe di wêjeyê de jî bilîze em bidin nasîn.

Wêje tê wateya axaftina der barê demekê, hinekan, rengê jîyanê de, tê nivîsandin û ev dibe pirtûk an jî xîtabek an axaftinek bi bandor ji bo demekê yan hinekan tê kirin ango; xweşîkbûn e, xweşîkbûnê ava dike, em dibêjin wêje axaftinê xweşîk dike.

Lewma wêje afrîneriyeke xweşîk e di xwezayê de, dema ku em îro rastîya xweşîkbûna jinê di xwezayê de meyzê dîkin, û rengê ku jin dide xwezayê, çima îro jin ne di wê rolê de ye? Jin di civaka xwezayî de, ku civaka xwezayî bi hezarên salan dewam kir, ez dikarim bêjim jin di rastîya civaka xwezayî de romanek pir xweşîk bi xweşîkbûna xwe nivîsand, karî di vir de rastîya jin a wêjeyî derxîne holê, hem di milê jîyanî de hem di milê felsefî de, lê belê romana wê nehat nivîsandin, çimkî wê demê tiştekî nivîskî tine bû, pê re jî ev rastî nehat îfadekirin. Dîrok hat berovajîkirin û her kes dizane dîroka jinê ne hatîye nivîsandin, ne bi awakî romanî ne jî di dîrokê de hat nivîsandin.

Jinê çima nekarî bû xwe îfade bike

nav wêjeya giştî de erê dîkin û biwêjeya giştî re nakok nabînin.

Lê tişta ku dîyar dibe, ta niha hîna lihevkişî ser heyîna wêjeya jinê nîne û di vê derbarê de nerînên cuda hene, hin dibêjin; hemû berhemên ku di nava xwe de doz û kêşeyên jinê dihewîne, heger nivîskar jin be yan mêr be weke wêjeya jinê bi nav dîkin, nerîneke din dibêje; wêjeya jinê berhemên jinê yên girêdayî doza jinê ye. Her wisa nerîneke sêyemîn heye dibêje; wêjeya jinê hemû berhemên jinê yên hemû karûbar û dozên mirovî digre nava xwe.

Lê kesên dijber, tekez dîkin ku hemû berhemên wêjeyî yên jin û mêran, berhemne mirovî ne nabe bên parçekirin û nabe ku wêjeya jin û mêr ji hev bên veqetandin.

Tevî derketina nerînên cûrbecur, lê wêje bi giştî di nava xwe de ji hemû hêlan ve(naverok, teşe) tê dabeşkirin. Mînak beşa wêjeya zarokê, ev nayê wateya ku divê wêjeya mezinan jî hebe, nizbet wêjeya jinê jî, taybetmendî û şert û mercên objektîv ên jinê xwe di vê derbarê de ferz kir. Ji ber ku rewş wisa ye, pênasîya herî guncaw û nêzî rastîyê ji wêjeya jinê re ev e: berhemên jinan ên ku karûbar û dozên civakî û mirovî digre nava xwe, her wisa mijar û dozên taybet bi jinê, di heman demê de ev dikeve nava têgihiştina wêjeyê bi giştî, û di vir de ev dijberî wêjeya giştî dernakeve.

Ji ber girîngîya vê mijarê û nîqaşên ber ferih di vê derbarê de. Desteya sernivîskarîyê ya kovra Şermola pêwîstî dît ku di dosyayeke taybet de bê guftûgokirin, her weha hejama çaremîn bi giştî ji bo berhemên jinan ên wêjeyî hate veqetandin, ji bo jina wêjevan berhemên xwe pêşkêş bike û nerîn û dîtinên xwe bîne ziman.

Pêşekî

Wêjeya jinê...



Desteya sernivîskariyê

Ji hezarên salan ve desthilatdariya zîlam ji hemû alîyan ve ser jinê tê meşandin, vê sistemê bi hemû rêbazên pêkan hewil dîda ku rola jinê di qada siyasî, aborî ...hwd de qels bike. Her wisa sistema cihanî ya serdest, bi kiryarên herî qirêj asta jinê kêmkir û ew veguhezand amûrekî bazirganîyê.

Di destpêka sedsala nozdehan de, jin ber bi ronesans û vejînê ve meşîya, û daxwaza mafên xwe di gelek alîyanên jîyanê de kir. Hin bi hin rewşa jinê ber bi başbûnê ve çû bi rêya tevgerên azadîya jinê di sedsala bîstî de gelek mafên xwe bi dest xit. Bi hêzeke mezin derbasî qada wêjeyê û rewşenbîrîyê bû, lewma wêjeyêke taybet bi jinê derkete holê.

Lê ta niha nakokî heye di qada wêjeya giştî de derbarê tesnîfkirina wêjeyêke taybet bi jinê, ev nakokî di qada wêjeya jinê de jî heye. Kesên piştgirîyê dikin dibêjin; jin di hemû alîyanên jîyanê de xwedî taybetmendî ye, lê di encama piçûkkirinê dîrxistina wê bandor li rola wê ya civakî kir. Ji ber vê pêwîstîyê ku mirov, destê û senifandinên taybet bi jinê derkevin, ji bo parastina hebûna wê û aktîvkirina rola wê ya mirovî, weke taybetmendîyêke erênî dibînin û wêjeya jinê di

- **werger**
 - Rola jinê di wêjeyê de .. (Fehîma Deştan, Wergera ji Erebi: Şînda Abê) 39
 - Heya giha tifaqê..hasil giha Mûsil.. (Zekereya Tamir, Wergera Ji zimanê Erebi: Hemrîn Osman)..... 42

- **Huner**
 - Wê bavê min bê.. (Fatma Ehmed) 44

- **Çîrok**
 - Nivîskarê Min.. (Midiye Berekat) 47
 - Çolo.. (Narîman Evdikê) 48
 - Alfabeya Qurbanîyê.. (Hind Ebdelo) 50
 - Ji himêzkirina wî têr nebûme.. (Zinarîn Diyar) 55
 - Name.. (Mufide Koto) 61

- **Helbest**
 - Dexîl yareb!.. (Maral Xezal) 63
 - Min dil daye bêdengiyê.. (Fatma Savci) 64
 - (Roza Metîna) 65
 - Ez û tu.. (Şama Mihemed) 67
 - Henasên bêrîkirinê.. (Hêvîn Hiso) 69

- **Serbest**
 - ZENG Ê BENG an ŞENG Ê PENG?.. (Emîna Emerê Ebdile -Keça Kurd) 71
 - Sosreta dîtîne .. (Lîlav Îsa) 75
 - Jin û nivîskarî.. (Veîjna Kurd) 78
 - Daxuyanî bi boneya yekemîn salvegera damezrandina kovara Şermola ya wêjeyî.. (Deştaya sernivîskariyê) 81
 - Daxuyanîya sernivîser û nivîskarên kovara Şermola ji bo şermezarkirina êrîşên dewleta Tirk yê li ser herêmen bakur û rojhilatê Sûrîyê..... 82

Naveroka Hejmarê

- **Pêşekî**
 - Wêjeya jinê..... (Desteya sernivîskariyê) 5

- **Analîzên hizrî**
 - Rola jinê di wêjeyê de ... (Zelal Ceger) 7

- **Dosyaya hejmarê**
 - Jina wêjevan.. (Zehra Tunc)..... 12
 - Jin û wêje.. (Cîhan Hesên) 16

- **Lêkolîn**
 - jin.. ji tarîya bindestîyê ber bi pencereya serxwebûnê ve... (Xunav Kano) 18

- **Hevpeyvîna hejmarê**
 - li gel nivîskar «Peyman Bêrî» ye (Desteya sernivîskariyê) 22

- **Jin û çand**
 - “366 Jinên Wêjevan” .. (Fatma Sîdo) 27

- **Pirtûkên derketî**
 - Xwendinek li ser Romana “Hinara Dawî ya Dinyayê” ..(Zozan Birko) 29
 - Pirtûkên derketî.. (Desteya sernivîskariyê) 36

Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê aştê keda çandî bilind bikin di rewşen herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî, herêmî û xwecihî tevî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbanîyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bideştixistina jiyanê demokrat û azad, ku nîrxên civakbûyîna yê bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênuşên şareza de radaya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî aştê bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bîngeh û hêzeke bandorker, ku aştê civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşen awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştî re ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînan hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendekê dîrokî digre ku reseniyekê ramyarî û wêjeyî peyît dike, ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şîyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şîyarkirîna de dike, her wiha veguhestîneke bê hempa di rojava çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane û serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebi li Bakur û rojhilatê sûriyê tê weşandin.

-Di 24 Êlûna 2018'an hatiye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7ê Sibata 2019'an de derket.

-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Cizîrê girtiye, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019'an Hatiye Dayîn.

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.

-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.

-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û politîkayên kovarê derbirin dikin.

-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvên de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyvên de be.

-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:

Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.

-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bînirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên giştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê giştî:

Dilşad Murad

Sernivîskarî û Desteya sernivîskariyê:

beşê Kurdî:

Aram Hesen

Aram Hesen

Derhêner:

Ehmed Alyûsiv

Dîlan Ehmed

Zozan mihemed

Arşîv:

Şêrîn Heso

-Malpera kovarê:

www.shermola.net

-E-MAIL:

shermola2018@gmail.com

-Telefon û whatsapp:

0998149668

-Kovar li çapxaneyê Sîmav – qamişlo tê çapkirin.

-Belavkirin û firotin li bakur û rojhilatê surî beşgeha Alşemal – qamişlo 0998234958.

-Pirtûkxaneyê Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.

- Nirxê kovarê (100 L.S.).

Dosyaya hejmarê

wêjeya jinê



Tabloya Qapê: Şêrin Ismayîl

**Hevpeyvîna hejmarê
li gel nivîskar
Peyman Bêrî ye**

**jin.. ji tariya
bindestîyê ber
bi pencereya
serxwebûnê ve**

**ZENG Û BENG an
ŞENG Û PENG?**